


welat

Sal:2 Hejmar: 71 27 Heziran-3 Tirmeh 1993 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyi

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya:

**'Em mecbûr in
ji her aliyî ve
bixebeitin'**



Rüpel 5


Hem rengê têkoşînê, hem jî ber û îmkanên wê ji hemû deman bêhtir û firehtir bûye, gelê Kurd dengê xwe digihîne her derê û dewleta Tîrk jî baş dizane ku:

Ev deng nema tê birrîn

Rüpel 8




Gelê Kurd li hember kirinê dewleta Tîrk ên derveyî mirovahiyê bêdeng namîne û her diçê bi awayên cur be cur dengê xwe bilind dike. Li Kurdistanê û Tîriyê bi girtina kepeng û kontaxan li Ewrûpayê jî livbaziyê li dijî saziyên Tîrk gelê Kurd reaksiyonê nişan dide.



Resamê Kurd Fevzi Bîlge:
**'GEL DI BERHEMÊN
MIN DE XWE DIBÎNE'**

"Bikaranîna rewşa gel a berbiçav jî peywîreke ronakbîrîtî ye. Divê ku ronakbîr, hunermend di berhemêن xwe de rewşa gel bi kar bîne û bide xuyan."

Rüpel 6



YEZDANÊ 'YEZDANÊ MÊŞAN': WILLIAM GOLDING

Golding ku di heştê û yek saliya xwe de ji ber krîza dilê xwe, weke ku rojnamevanekî Fransiz dibêje "Mêşen xwe sêwî hiştin", ji deh salan û vir ve li gundekî bajarê Tulîmarê bi tena serê xwe dijiya.

Rüpel 13

Nameyek ji gerîla re - 3

Nizanım bê ci bi min hatiye van rojan, ez bûme weke bombeya di desten te de ku, pîmê wê jê hatiye kisandin; kengê û li ku bême teqandin nema zanim. Hevalen min ên di binê zilm û zora neyan de ku dinalin..li binê zindan tene bîra min. Hûn tene bîra min hevalen min ên ku min ew bi rihê xwe nedidan sehid ketine, tene bîra min û yên ku niha ji neyaran re defa sînga, xwe dike weke ciyavê. Agiriye ji bo serxwebûn û azadiya welêt tene bîra min. Dinya li ser serê min dice û tê. Ez gêj dibim, gêjbûneko bi hêrs, gêjbûnek tolehidanê. Min pirr bêriya te û hevalen te kiriye. Gelo rewsa we cawa dice? Ji rewsa we pê ve tu tist min elaqedar na ke û cavên min tu tisti nabîne. Ditin, bihistin û gotin na be weke hev!

Bûn weke mîkroba qanserê (!) ketine lasê min, ne hûn dihelin ku ez rehet bibim

û ne hûn dihelin ku ez ji xwe re bimirim! Bi roj, bi sev, her gav hûn di bîra min de ne. Li ser xwarinê, vêxwarinê, di si-yarbûna xewê de... Ez nema zanim bê ez cawa bikim!

Xwedêgiravî hew riyek heye ku ez ji vê gêjbûnê xelas bibim! Dîtina te. Lé cawa?

Dengê te dibihizim. Tu dibêji: "Ji cihê xwe rabe û berê xwe bide her derê welêt û ji her kevir, dar û beran min bipirs! Ez li wê derê me. Tu dê min bibinî. Ger disa te ez nedîtim, bas li axê binêr tê nuqtên xwînê bibinî, bide dû wan nuqtên xwînê tu dê min bibinî. Ger wê gavê ji te ez nedîtim, her cem bijjîkên cavan! Cavên te baş nabi-nin!!! Tu ji zû de miriyî kesê ku li halê te bigirî tune. Wey li halê te."

Zinginî ji serê min tê, ez te baş his dikim. Ez tê fêm dikim. Weke ku te ji min re go-tibe, ez ji cihê xwe rabûn û min berê xwe da cihê ku go-

palen pirsan qasî bedena min mezin bûn. Ketime navâ gopalen pirsan! Gopalin jê ketin qirika min, hinin jê ji, li lingê min de alîqin! Yek heban ji, li nav cavên min ketin. Ketime şerekî giran bi gopalan re! Her û min re stend ber bi te ve, gopal bi-cük bûn, gava ku ez nêzi cih û warên te bûn, ji wan gopalen mezin tiş nema!!!

Bêhna te dihate min, lê hîna min tu nedidit. Bersiva te hate bîra min. Min tu ji kevir û daran pirsî, ketin siklê te, bi min re kenian. Min fêm kir ku, ez nêzi te bûme. Min riya xwe domand. Ez qedereki meşiyam. Westiyabûm. Rûniştîm Min cixareyek pêça, pala xwe da tehtekê û min berê xwe da ewrên sayî: Ewran ez ber bi xwe ve kisandim. Ez li ser ewran bûm. Ci bibinîm? Herçi sehid li wir bûn. Di desten hev de bûn, rabûbûn dîlana azadî û serxwebûnê.

Min ew pirr sa dîtin. Ez ji, bi vê sabûna wan sa bûm. Nêzi wan bûm, sedemê vê sabûna wan pirsî, kecek ji dîlanê ve-quetiya ber bi min ve hat. Parçeyek ji hivê kêm bû, gelo ew keç hîy bi xwe bû? Nizanîm! Gote: "Sedeme vê dila-na me, tolehildana bindestiya hezar salan e, neketina her sê alan e, dîtina rojîn azad û serbixwe ye, dîtina şerê ser-vanen jérin e... Jér..." Ez li ser ewran ci dikim? Kengê hatim vir? Kê ez anîm? Kê ez anîm kê...?

Ez li jér, li ber tehta xwe paldayî bûm. Ji ser ewran daketibûm û li ser axa sar ku bi xwîna sehidan hatibû av-dan bûm. Min xwe hebekî rast kir ji cihê xwe, cavê min li ser axê ket. Nuqtên xwîna sehidan hate bîra min. Li xwînê geriyam. Belê qet min nuqtên xwînê nedîtin. Gola xwînê hebû. Gol... Di gola xwînê de ez li pirtikek axa bê xwîn geriyam!

Min... Ez tevî xwîna te bûm û xwîna te tevî min.

I. Xort

FERHENGOK

- Alîgir:** Terefdar, sempozian
- Alîgiri:** Terefdarî
- Azwerî:** İxtîras
- Bîrawer:** Rewşenbir, Bîrdoz
- Bîrawerî:** Rewşenbîri,
- Dergistî:** Nişankirî, xwestî
- Destgirtî:** Tima
- Destvala:** Bêçek
- Destvekirî:** Merd
- Dilbijek:** Çav li mal û milk
- Gemar:** Qirêj, çepel
- Gemarî:** Qirêjî, çepeli
- Gemirandin:** Qirejkirin
- Honandin:** Münandin,
- Kargêri:** İdare (yönetim)
- Lengergeh:** İskale
- Paxav:** Tirs (çekinme)
- Peyker:** Heykel
- Peyrew:** Xelîfe
- Peyrewî:** Xilafet
- Pêşande:** Nişandina
- İstikîn sînemê, şanogeriyê**
- Pêşangeh:** Sergî
- Rist:** Rol
- Ristin:** Ji çekirina ta, ben, ku ji hîrî, rîs, pembû û hwd, dibe re tê gotin (eğirmek)
- Raçandin:** (dokumak)
- Sernûçe:** Nûçeya herî gitîng (baş haber)

wan ciyayen pîroz eme hev bibinîn. Bi hev re tivingen xwe hembêz bikin û li ber pêlén ala xwe goven-da hebûnê bigirin. Hel-besten evinê û jîna pîroz bixwînin. Heta hingê ji, tu bimîni di xwesiyê de û li gel silavên şoresgerî ji bo hemû hevalan û ji bo gelê me yê serhîdêr ji, hezar silav.

Selîm Biçûk

Nameyek ji welatê biyaniyê ji bo hevaleke şoresger

Hevala rê(R)! Her ez cîqasî ji tê dûr im ji, lê ji ber ku rehîn dilen me bi hev ve ne, xwîna me di yek rehê de digere. Bi lêdana dilan re em bi hev dihesin. Dengê dilê te bê cawa li ber xwe dide, tê guhîn min. Her sev di xewnen xwe de te di refen gerileyan de dibinim. Li desten te gulen kesk, sor û zer tu pêskesi zarokan dikî. Ew tirsa hov di cavên wan de, ew gîriye li ser lêvîn wan dikî hîvî û kenê sîrin.

Ez nizanîm niha tu li ser kijan zinari û ci dikî. Li Botanê, li Agirî, Gebärê, Bagokê, Bêxêr, Heftanînê, Xakurkê an ji, li Seradest. Her ev naven cihêregin ji, lê di dilen me de yek quinci digirin. Tu li kuderê bi, bila-bibi, lê tu nêzikî min i. Gavên me bi hev re tê avetin. Dilen me be hev re lêdidin. Tu di jiyan û dilen min de, di ramana min de kar dikî. Tu bawer dikî ku serê sibehê ez li dengê teqîna tivinga te hisyar dibim. Ew dengê zelal ku bêdengi-va li ser nemafdarîyê dicirine, guhîn kerr li ser fastiyê vedike; her wiha cavên kor bironahiyê pîroz dike, lalan

dipeyivîne. Kaniyen jiyan û hebûnê, demarên hatin û manê ji, ji wî dengê zelal û pîroz dertên.

Hevala gernas! Min bîhistiye ku, hevalê nemir (X) sehid ket. Bêguman tê bîra te dema ku, em komek ji hest hevalan bûn. Me sev bi rojê re dikir yek. An di nav û avnusa capê de diman, an ji, li ber têlén rêsayı. Li ser sînorên cêki-ri, ew tixübén sexte ku ye-kitiya gelê me birîn dikin. Dilê Kurdistana me parce dikin. Li ser wan sînoran em dibûn mîzgîna yekîtiya parçeyen Kurdistanê, komên hevalan. Şervanen serxebûn û azadiyê. Pêxemberen jîna nû, ref bi ref me bi re dikirin û her diman bi hesreta cûnê.

Hevala rê! Ez bi hesretra dîtana te me û dilen min bi hêviyan tije ye ku, nêzik ne dûr li ser wan ciyayen bilind eme hev bibinîn. Bi hev re ala rengin dacikinin. Hingê dilen me li ber pêldanen wê dê bên semayê û melodiyen bêmirin derbixin. Mîlodî û semaya evîniya ku kesi nedîtiye û nebihîstiye.

Hevala hîja! Welatê me wargeha evîniye ye. Evîna

bilintir ji, evina welat bi xwe ye ku, evîna deş, zînar, cem, çiya, gel, dîrok, zîman, gund, bajar, dayik, bav û mirov, yar çand û jiyanê di nava xwe de dicivîne. Lewma ku, em dikarin bi hîsanî canê xwe bi gorî ve evîne bikin û riya mirinê

bisopînîn. Bi vê mirina bîrûmet ji, em jiyanê diafirînî. Ji bo vê ji, em dibêjin: "Jiyana bi rûmet ji bin piyên gerîla dertê û bi şehîdbûnê digihe armanca xwe."

Ez nabêjim bi xatirê te, ji ber ku di nêzik de li ser

Çapemenî û çand

Beri her tişti em silavên xwe yê şoresgerî yê bêdawî ji we re disînîn, di kar û xe-bata we ya çandî û konevanî de serke-tinê dixwazin. Her weki ku tê zanîn ji, iro li welatê me ji demeke nû dest pê kiriye û rüpeleke nû vebûye. Gul û kulilkên jiyanâ nû, bi awayekî serbixwe û azad li carme-dorê welatê me vebûne û geş bûne. Dic-le, Ferat û Munzûr dilîlinin; Cudî, Here-kol, Bagok, Zagros, Sîpan û Agirî ji dilan digirin. Kawayen xwe hembêz dikin..

Dema mirov li dîroka mirovatiyê ya hovîti û gemartiya dagirker û mîtingeh-karan dinêre, inirov dibîne ku, dagirker û mîtingeh-karan cawa ax, gund û bajarên gelan xistine bin desten xwe, tunekirina wan dane ber xwe, xwestine ku gelan ji cand û hunera wan dûr bixînîn, bi wan bidin bîrkirin, kerr û kor bîhêlin.

Welatê me ji, ji me tevan re xuyaye ku, di rewseke wiha de ye û xwediye birîneke wiha ye. Her cîqas bi serê, me yê neteweyî pêngavê mezin hatibin avetin û pê re pêsketinê xurî cêbûbin, berhem û fêki

derketibin hîlê ji, gava mirov li gorî deme rewsê di ber cavan re dibihurîne nebesi, kemasî û li pas mayîna cand û hunera gel dibîne. Pêvajoya ku em tê de nû derbas dibin, ji bo sînbûna cand, huner û wêjeya gelê me pirr girîng e û xwe-diye wateyeke mezin e. Lewre tistê ku soreşan nemir dike, dixemiline, bi deng, ziman û bi nirx dike berhemên hunerî û candi ne.

Bi rastî gava mirov xebatê çandî, hunerî û konevanî li gorî mercen deme di-nirxîne tê dîtin ku, cihê herî mezin cihê Welat e. Lé hema em jînên girti yê Gir-tîgeha Amedê ya Navendi nikarin we-sanen we bixwînin. Ji ber ku nagihêje destê me. Xwesteka me ji we ew e ku, hûn ji me re, ji niha pê ve her hejmarê Rewsen. Welat û hwd, bisînîn girtîgehê. Ji ber ku em karibin xebatê xwe yê candi û wêjeyi bi pês ve bibin û ji bo xizmeta gel û civaka me xwe bigihînin we.

Mizgîn û Arjin
Girtîgeha Amedê ya Navendi

Bûyerên cengê:

Kurdistan giş warê şer e

Bi xelaskirina pêvajoya şerrawestinê û ji nû ve destpêkirina şer, berê têkoşinê ji her dem firehtir bû operasyonê dewletê ji bi awayekî barbartir didomin.

Navenda Nûçeyan- Di vê heftiyê de ji operasyonê dewletê dom kîrin. Ji érisen ser malan ta bi girtina pitikên (bebék) dergûsan û kustina mirovên sivil derbas bû. Li hember van hovîtiyan gel bî xwestina ERNK'ê protestoyê kepen-girtinê li dar xistin. Gerilayê ARGK'ê ji nesekinin û li her deveren Kurdistanê avêtin ser qereqol, tabûr û hêzen leskeri.

18 Heziran 1993: Di 11'ê Heziran 1993'yan de hêzen dewletê yên leskeri diavêjin ser gundê Hamramiyê ku li ser navceya Cinarê à Diyarbekir ye. Pisti vê érisê ji gundvevsi Kaymaz (30) bi xwe re dibin. Dotira rojê bi telefونê malîyen wi agahdar dikin ku, cendekî wi li Nexwesxaneva Dewletê va Amedê ye. Di dawîya otospivê de tesbit bû ku bi satorê hatiye kustin.

Leskeren li gundê Elfan ku li ser navceya Stewrê ya Mardinê ye, sagirteki bi navê İrfan Fidan kustin.

Gundiyan gundê Korû ku li ser Pîrin (Adiyaman) ye, tevi 80 imzeyan seri li walîtiyê dan ku navwazin li gundê wan cerdevantî bidome.

Di 17'ê Heziranê de li Amede ERNK'ê ii bo protestokî rîna qirkirin û operasyonê dewletê bangî gol kiribû ku, kepengen dikani xwe bigirin, gel ii - 100 besdarî vê bangê bû, dikani xwe girtin û sotoran û kontaxen erebetin xwe radan. Li ser vi awayî hêzen dewletê erisi dikamîn esnafen navceva Hezrovê kîrin. Di vê erisê de leskeran ii esnafan re: "We do ji bo gerila kepeng qirin. Hûne iro ñ, ji bo me bigirin."

Li Licê ñ-hêzen dewletê bi cekan li navenda navceya berê xwe dan dikani esnafan. Di vê erisa dewletê de mal û dikani gelek kesan zerar ditin. Hîm ñ wan kesan ev in: Orfi Aksit, H. Fettah Delidere, Hasan Denizel, Mehmet Ekinci, Tahîr Ekmek û Vedat Callen.

Li nezikê gundê Xerakelê ku li ser navceva Licê ve timen tabutî komponeke barkan sevitandin. Timen tabutî xwestin ku sofere we ñ bikurin bes ev pek neanim.

Pisti kû firmacîn seyahetê besdarî protestocî bûn, ii wan firmacîn Öz Dîcarbakir û Dîcarbakir Sur bi emrê walîtiyê ceza standin.

Xevni Hezîo û Licê, hêzen dewletê li Mersinê û cerdi dikani esnafen ku besdarî protestocî bûn, kîrin. Di vê erisê

de polisan li kahwexaneyê taxê Gündogu, Yenîpazar. Demirtas û yê din geriyan ji ber ku kepengen xwe girtibûn, risqetiyen (rûhsatên) wan ji wan standin.

19 Heziran 1993: Li gundê Sebânê, Bîlawê û Gömkê ku li ser navceya Sasonê Batmanê ne, di nav hêzen leskeri yê dewletê û gerilayê ARGK'ê de berdestî sibehê saet di 05.00 an de ser derket. Di ser de 2 lesker mirin 4 ji birindar bûn.

Ciyavê Licê hatin bombe-kirin. Gundê navceya Licê ya, Akro, Singê, Kelê, Sêxtembür. Ciayêsilêman Dehbagan û Ciayêyecüm ji aliye balefirên leskeri ve misêwa hatin bombekirin.

Di vê bombardumanê de heyvanen gundiyan gelek telef bûn. Weki din hêzen leskeri yê dewletê ji bo ku gundiyan gundê Mirangê koc bikin, zordestiyê li wan dikin.

Gerillayê ARGK'ê avêtin ser gundê Xarik ku li ser navceya Bazid Agiri ye. Di vê cerdê de gerila 8 malen cerdevanen sevitandin û cerdevanen bi navê Huseyin, Mehmet, Mustafa, Kadir Zeki û Hemza Akkoc, İsmail Dursun û Hasan Akkus bi xwe re birin.

Li gundê bi nave Nureddin a Melazgirê ya Musê lesker dema ji operasyonê vedigerin bi re de kecike, 12 sali bi navê xwe Seher Yananer dixin binca. Neziki 200 kes ji gund li ber Emniyeta Melazgirê rûdin heta ku. Seher Yananer tê berdan.

Li Derika Mardinê li gundê Sada tevi 5 pitikan (bebekan) 8 kes hâtin bînâvîkirin. Sedem girtina pitikan naven wan in: Mezlûm, Nasir û Sozdar.

20 Heziran 1993: Li hela Cemêsemo li Cepekcûrê (Bingöl) kontr-gerila Fırat Tur-gut, Süleyman Bingöl û Yilmaz Arvan kustin.

Gerillayê ARGK'ê eris birin ser qereqolo Dihê û ew dan ber roketavêjan. Dawî di nav gerila û leskeran de lihevxitin cebû. Navê zanin ku cend lesker hatine kustin.

21 Heziran 1993: Gerilayê ARGK'ê li Culemêrgê li Taxa Ketremasi miqteya polisan dan ber roketavêjan. Polisek bi navê Yusuf Kayali hat kustin. Li ser vê yekê hêzen dewletê bi 3 saetari malan dan ber gulevan. Malen gelê Ketremasi xesarek mezin ditin. Cervana gund hat birin û derketina derve qedexe bû.

Gerilayê ARGK'ê avêtin ser saha petrola hêla Xerzan. Tanqa ku petrolê dicivîne, sevitandin. Karker Emîn Canpolat û lesker Kenan Tugluoğlu mirin.

Gerilayê ARGK'ê gundê cerdevanen yê bi navê Lepêna ku li ser Hesenkeyfa Batmanê ye dû cerdevan Süleyman Toğ û Ekrem Toğ birindar bûn.

Li gundê Korik ku li ser Batmanê ye, gerila gundiyan ci-vand, propaganda kir û 2 milion û nîv pere xistin devê cerdevan Ebubekir Akdag û ew kustin.

Li Bazidê' di nav gerilayê ARGK'ê û hêzen dewletê de ser derket. 10 lesker birindar bûn. Pisti vi seri leskeran xwestin gel ji cihê wan koc bikin.

Li Edenê ERNK'ê belavokek belav kir. Di belavokê de ji bo ku gel kirin û operasyonan protesto bike, hate xwestin ku kepengen bigirin, qontaxen erebeya radin û zarokên xwe nesin dibistanê. Ji xeyni navenda bajêr temamê taxan ev xwestin bi cih anî. Tirk û Erebêne nevere ji besdarî vê protestoyê bûn. Pisti vê protestoyê tîmîn Taybetî taxan ku Kurd le dijîn bi sev, sererast dan ber gulleyan.

22 Heziran 1993: Gerila li Kevirêqul neziki Bilisê, kemin dani. Di vê kemîn de 6 tim, 5 lesker û 3 cerdevan birindar bûn. Di lihevxitineke neziki ci-yayê Agiri de 10 lesker mirin.

Timen Taybetî avêtin ser gundê Helvendi ku li ser navceya Cinarê ya Amedê ye. Gundyan li meydana gund civandin, ji saet 4'ê ber êvarê heta 12'ê sevê bi daran li wan dan 6 gun-di birindar kirin. 7 kes ji bi xwe re birin.

23 Heziran 1993: Gerila avêt ser 5 tabûran. Gerila avêt ser tabûra Keryares ku li ser navceya Silopi ya Sirnexê ye. Gelek lesker hatin kustin, tabûr xesareke mezin dit û gerila gelek cebilxane bi dest xistin. Weki din gerila avêt ser tabûra Zevê li herêma Harûna di nav lesker û gerila de ser derket. 4 lesker mirin.

Dewlet tabûra Hilalê vala kir. Gerila avêtibû ser vê tebûre û gelek lesker miribûn.

Li navceya Bazidê, ya Agiriyê di navbera gerilayê ARGK'ê û hêzen dewletê de ser derket. Ser di navbera gundê Mihtepê ta gundê Sûphan ku di quntara Ciayê Agiri de ye cebû. Ji leskeran nezi 60 kes birindar bûn.

Gerilayê ARGK'ê dinavbera Mûs û Elezizê de trêñ sevitandin. Zerar zêdeye.

HAWAR

Dilbixwîn

Li pişt sinor

Eger derfet (îmkan) peyde bibuna mirov li ser sinorê ku di pêşira Kurdistanê de bûne kul û bîrov, çend roman binivîsandana û hemû derd û axînên xwe réz bikirana. Mixabin romanivîsen me xwe bi mijarêni wiha dewlemed re mijûl nakin.

Çiroka sinor geleki dirêj e. Honandina wê bi pênûsê geleki dijwar e. Çiroka mirinê ye, çiroka nalîna di şevê tarî yê bêstêrk de ye, çiroka keser û hîzringên kûr e, çiroka parçekirina neteweyekî û birrandina xakekê ye... Belê looo, ew çiroka mayîn û standina jîyanê ye.

Li ser bûyerên sinorî, mirov dikare ci bibêje? Li ser kuştina ciwan û bavegîdan, li ser hêstirêni di çavên dayikan de ku bi pey wan diketin û diçûn dawiyê li wan diwarên têlin rast dihatin. Iê li ser zarokên ku bavên vêne xwe li ser winda kiribûn û sêwi mezin bûbûn?

Ezê ji we xwendevanen hêja re dramaya pirejineke Kurd bibêjim. Meta Fato: ez bawer nakim hûn wê pirejina (55-60) salî nas bikin. Bi rastî ez bi xwe jî nizanim çawa di nive vê şeva tarî de hate bîra min.

Deh salan beri niha, di 1983'yan de. Cejna Qurbanê bû. Barjarê me li ser sinor bû. Sinor bajar bi du parçeyen beş kiribû: Yek di bin destê Süriyê de, parçeyê bâkur ji di bin destê Tirkîyê de. Lî (%80) mirovîn vî alî li wi alî û yêne wi alî li vi alî hebûn, heya niha ji ew nezibûn dom dike. Kurdên her du alîyan tenê dikaribûn di rojên cejnan de hev bibînin, lê li pişt sinor. Hevdîtinê din ên serbest qedexe bûn. Wan rojê xweş de ji polis û

çiroka sinor geleki dirêj e. Honandina wê bi pênûsê geleki dijwar e. Çiroka mirinê ye, çiroka nalîna di şevê tarî yê bêstêrk de ye, çiroka keser û hîzringên kûr e, çiroka parçekirina neteweyekî û birrandina xakekê ye... Belê looo, ew çiroka mayîn û standina jîyanê ye.

cendirmeyen herdu hêzen dagirker li ser serê gel radiwestiya û çavdêriya wan dikirin. Bi rastî hem xweş bûn hem ji reş bûn ew rojê drama- komedyayê.

Em zarok bûn, me tiştek ji felekê fêm nekiribû. me nizanibû ken û girî têne ci maneyê. Hengê temenê me 10-12 sal bûn. Em serê şeveqê radibûn û me berê xwe dida ser sinor. Qiymet bû, bi hezaran kes li her du alîyan kom bûbûn. Dibangan-din, yekî dengê yê din nedibîhist. li hal û demê hev dipirsin, gelek caran kesen ku li rewşa wan dipirsin mirî derdiketin û şin û girî dest pê dikir, li alîyekî dawet li alîyê din jî şin bû. Ji hevle xelat dihanin, diavétine hev. lê pirrani caran nedigîhiye xwe-diyê xwe û li têlan diqelbîn. Vê carê mirov di dilê xwe de nifrin li wan sinoran dîbarandin.

Ez hengê zarok bûn. Baş têye biran min, li pişt gelé ku diqêriya Meta Fato serê xwe danibû ser her du çokan û tera dilê xwe digirîya. Dilorand û bêhemdê xwe şinêk danibû. Ez ber bi wê ve çum, dilê min pê şewîti, min hew dit ku ji çavên min ji hêstirêni xwe avêtine der. Meta Fato wiha loriq digotin:

"**Ehmedo lawo, bejna te zirav weke şitlawo/ Egîdê ciwan xortawo/ Çavan digerînim te nabînim/ Ez bi qurban bîrawo...**" Min hengê ev gotin fêm nedikirin. Ez li ber rûniştîm û min jî pîrsî: "Tu cîma digirî mete? Hineki serê xwe rakir û bi dîlovanî gote min: "Ez panzdeh salî bûm, diya min, mir, bavê min ez şandim. Binxeze min mîr kir, haya niha min bav, ne bîra û ne ji xuşkên xwe kesek ji wan neditine, mirî ne, zîndî ne haya min jî tune ye. Digotin beri (5) salan birayê min Ehmed hatibu min bibine. li ser vi sinorî bomba pêve teqiyabu, bila ciwaniya te sax be kurê min çübû rehmete. Ez perişana berdiwaran bêxwedî û bêkes name..." Destê ku dilerizin direji paşîlen xwe kirin û çend wêne derxistin: "Ev bavê min e, xuska min e, Ehmed birayê min e... Cavên min baş nabinin, belê ji diya xwe re çavan bîgerine, belki tu wan bibîni, bila ez bi wê hesretra necim gorê." Lî qiyamet bû, Kî dikare kî bibîne! Hina Meta çiroka xwe temam nekiribû. Me hew dit ku ji niske ve deng bi G3 yan ket. Gel bi ser hev de hilwesiya, bû qire-qira jinan. Meto di bin lingênen gel de mabû, nikaribû bireviya ji, hinekan alikariya we kir, lê care ci ye, disa ji wan tifingan nikaribûn nalîna wê bidin sekinandin. Ro çu ava, Meta Fato radîheje tûrê xwe û ew xelatîn ku ji bo xuşkên xwe anibûn, berê xwe da mal, cavên we gelek tişdigotin: "Çiroka li pişt sinor" Ji bir nekin...

Konferansa Fiasco

Welat, Norwec- Konferansa Koma Netewan (KN) ya ku di der barê mafêni mirovan de di hefteyê cûyi de li bajarê Vien hatibû lidarxistin, bû fîaskoyek û hefta sermê, dibejê Serokê Amnesty International (Mafêni Mirovan a Navniewi). Serokatiya konferansê ji, ji aliyê xwe ve dide nîşan ku, dê endamén wan der barê beyaneteke hevpar de bibin yek û ew ji dê mafêni mirovan bihêzine.

Sekreterê Gisti yê Mafêni Mirovan Pier Sane, ku ji Sene galê ye roja dusemê konferansa hefteya yekemîn wek hefteya sermê bi nav kir.

"Ev konfernas bi tevayî fîaskoyeke mezin e, ev dizi ye û hefteyeke bi serm e," got Sane. Sane axavtina xwe wiha domand: "Dema berendamén ku dewlet û hikumetan sandine, di cihen luks de der barê mafêni mirovan de dipeyivin; li ser gerdûnê bi hezaran mirov têñ kûstîn, birîndar kirin, tedayî tê kirin, darvekirin û jiyanâ wan bi pestan tê tehdit kirin.

Ji rojnameya adreseavisen

FOCUS bi destê MÎT'ê dertê

Kovara Focusê, bi nûçeyên xwe yêñ as-paragas û dijîtiya Kurdan tê naskirin. Di hejmaren wê yêñ berê de ji gelek ni-vîsên ku dijminati-ya têkoşîna gelê Kurd dike hene.

Welat, Almanya- Kovara Focus di hejmara xwe ya 14'an de hevpeyvineke ku bi Sekreterê Gisti yê PKK'ê Abdullah Öcalan re cêkiribû wesand. Bes kovar wesana xwe ne li gor qaydeyê capemeniyê kiribû û hevpeyvinê ji rastiya wê dûr xistibû. Di vê hevpeyvinê de dihat idiakirin ku, Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan êrisen Neo-Naziyan ën li hember gelê Tirk biheq didit. Ev hevpeyvin bi navê rojnameyan Wilhelm Dietl hattive cêkirin. Nûnerê KURD-HA yê Rojhilata Nâvin M. Kesercioğlu diyar kir ku di dema hevpeyvinê de ew bi xwo ñi li wir buçê û leqaçî tu daxuvaniyê. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ën bi vi rengi nebûve. Li ser vi awa-ya ajansa KURD-HA der



Logoya Kovara FOCUS

heqê kovara Focus de lêkolîneke dorfirê pêk anîye. Di dawiya vê lêkolîne de dertê holê ku kovara Focus bi mîs-yoneke xeyni capemeniyê di-xebite. Kovar hejmara xwe ya yekemîn li Dewletê Yekbûyî yê Amerika diwesine û we-saneke Konseya Tirkê Dinyayê ye. Dû re li dewletê Eurûpa tev. bi pirranî ji yêñ ku Tirk lê dijin heftiyê carekê tê wesandin. Finansor û Serokê Konseya Tirkê Dinyayê M. Salim Öztoksoy armanca wesana kovarê bi vî awayî si-rove dike: "Em dixwazin fîkrîn ku li diji Tirkan ku bi salan e pêk hatine biguherînin." M. Salîm Öztoksoy ji xeyni kovarê xwedîyê sîrkete-ke bi navê BERTEX e li Frankfurtê. Firmaya BER-TEX'ê ji aliyê Balyosxaneya Tirk a Bonnê ve tê finanseki-rin.

Kovara Focus beri vê hevpeyvinê, di hin hejmaren xwe yêñ din de gelek caran rê da-yê nûçeyen asparagas. Di hej-

mareke wê ya meha Adarê de nîseke bi sernavê "Ji bo şerê rizgariyê xûgi" de idia dike ku, bi PKK li Eyaleta Bayiera pereyan ji gel dicivine û dike ku polis bi ser kesen Kurd ve here bê ev yek rast e an na? Bi vî awayî hin kesen Kurd ji ali polisan ve tên girtin. ERNK'ê nerastbûna vê nûçeyê diyar kir. Focus di nûçeyek xwe ya din de ji ajansa KURD-HA hedef nîşan di-de.

Berpîrsiyarek kovara Focus û Konseya Tirkê Dinyayê ji bo ku raya gisti bi ali Tirkan ve bikişinin ci ji dest tê dikin û li hember welatparêzên Kurd û calakîyen wan car ali bi ne xweşî dixebeitin. Di serê navbera PKK'ê û dewleta Tirk de capemeniya Tirk bi awayekî ne rast û ne li gorî exlaq û normen capemeniyê xebitî. Bi vî awayî di nav capemeniya dinyayê de ewlebûna xwe winda kir. Pisti ku bawerî bi capemeniya nava Tirkîyê de nema, vêca dewletê dest avet wesanen wek Focus li derive û ew finanse kirin. Ew ji li derive bûn dengê MÎT'ê û ji bo valahiya di vi warî de dagirin dest bi xebatê kirin.

Li Azerbaycanê iktîdara di destê Cepha Gel a Ebûlfez Elçibey de ket bin kontrola hêzên kolonel (serheng) Suret Huseynov. Serokkomarê berê Elçibey ji Bakû reviya û li gundekî Nexçivanê bi cih bû. Suret Huseynov ji xwe serokê dewletê ûlan kir û ji bajarê Genceyê Azerbaycanê idare dike.

Nûçeyen Derve- Serhilda-na di bin serokatiya Suret Huseynov de, pişti têkoşîneke demkurt, lê xurt, bû sebebê reva Serokkomarê Azerbay-canê. Elçibey, Roja 21'ê Heziranê Huseynov bi hêzên xwe yêñ cekdar girte ser pay-texta Azerbaycanê. Bakûyê û dest danî ser iktîdarê.


Beyî ku hêzên girêdayî Huseynov bikevin Bakûyê. Ebûlfez Elçibey reviya çû Nexçivanê. Pisti destdanîna ser iktîdarê. Huseynov dîsa vege riya bajarê Genceyê û da xuya ku, ji Genceyê wê Azerbaycanê idare bike.

Kolonel berê, Suret Huseynov idîakir ku, ji niha û pêve tu hêz nikare wî bide sekînadin. Hêzên Huseynov ji rîveberiya televizyon û rad-yoyê bigirin heta balefirgehan

hemû sazi û avahiyêne rîveberiya Azerbaycanê xistine bin kontrola xwe.

Li hin deveren Azerbaycanê lideren Cepha Gel, bangî gel kirin da ku li diji hêzên Suret Huseynov serî rakin, bes kesi guhê xwe neda wan û xwe tev neda. Lideren Cepha Gel, hêzên Huseynov wek alîgîren sistema komunîst a berê didin nîşandin û li diji wan propanganda dikin. Lê li gor nûçeyen ku ajansê biyani belav dikin, gelê Azerbaycanê % 90 alîgîren Suret Huseynov in, ji ber vê yekê anti progandaya zilamên Elçibey zêde pere nake. Li ailyê din, gelek lideren Cepha Gel ji alyê kargeriya nû ve hatin girtin.

Li Azerbaycanê, li aliyekî kontrola hêzên Suret Huseynov



Parlementoya ku ta berî hefteyekê di destê Elçibey de bû vêga ji aliyê hêzên Suret Huseynov ve tê parastin û nahêlin teref-dareki Elçibey nêzîkî wê bibe.

nov ciqas diçe zêde dibe û zilamên Elçibey yek bi yek ji rayedîrên xwe yêñ berê dibin û têñ girtin. Li aliyê din Ebûlfez Elçibey di gel du sed sê sed, muhafizên xwe li Naxcivanê li gundekî li hêviyê ye ku dawî li bûyeren Azerbaycanê werin û cereke din were ser karê xwe yê serokkomariyê.

Lê bas xuya dike ku, Elçibey nema karê xwe yê berê bi dest dixe: her ciqas Amerika û Tirkîyê desteka xwe ya siyasi û manewi jê re pêskes ji bikin. Jixwe, bi rastî, Elçibey ji bawer nake ku careke din karibe vegere ser kar xwe û dibêje: "Ger asî xwe ji Bakûyê vekisînin û teslim bikin ezê vegerim." Ev ji tê wê maneveye ku Elçibey dixwaze bibêje: "Ez nema dikarim ve gerim." Ji ber ku hemû râyeyen kargeriya Azerbaycanê ketinê destê hêzên Huseynov û Huseynov ji xwe qayîl dibêje: "Nema kes dikare min râwestine!"

Komcivîna YRWK'ê

Di rojên 25-26-27.6.1993'yan de Komcivîna YRWK'ê ya 3'yan dê were lidarxistin. Ev komcivîn dê ji her demê bêhtir bersiva demê bide. YRWK ji, ji bo ku berpîrsiyariya hemû guherînen vê kocbera dîroki bide û xwe bi firehi û kûrahi mezin bike û eniya rewsenbirî bi hêz bike.

Programa Komcivînê:

1. Vekirin
2. Xwendina Rapora Komiteya Amadekirina Komcivînê
3. Hilbijartina Diwanê
4. Xwendin û Pêskeskirina Mesajen Mêvanan
5. Rapora Politiki: Li ser rewsa cîhanê û Kurdistanê û kocber û guherînen nû dê bê rawestandin
6. Ji bo ku YRWK bikaribe bersiva dema nû bide û ji hemû hêlan ve û bi taybeti ji hêla rîexistin ve xwe fireh û mezin bike, destîra xwe ji nû ve di ber cavan re derbas dike û li gorî demê wê, nû dike
7. Kar û barê YRWK yê du salan. Ji Komcivîna Duyemin ve û heta iro bi raporekê têñ nirxandin
8. Kar û barê saxen YRWK'ê ji, bi raporê wan têñ nirxandin
9. Yekitiya Mamosteyen Kurd (YMK) û Yekitiya Xwendevanen Kurd (YXK) bi du raporan têñ nirxandin
10. Wek ku tê zanin di Konferansa Yekemîn de bîryara avakirina Enstitüyeke Kurdi û pêve girêdayî Pirtulkxaneyeke Neteweyî hatibû standin ji bo vê armance ji, komitiyeke amadekirina avakirinê hatibû hilbijartin. Ev komîte rapora xwe pêskes dike ji bo ku ev bîryar edî bikeve jiyanê
11. Raporek li ser maliya YRWK'ê tê pêskeskirin
12. Girêdayî Enstitüye Kurdi, dê li ser saxeki Kurdzaniyê (Kurdo loji) bê rawestandin
13. Komisyonerke zimanzaniya Kurdi dê bê sazkirin, ji bo ku bi a wayekî zanyarî li ser zimanê Kurdi bi hemû zaravayen wi ve xebat cêbîbin û bingehêk ji bo saziyeke neteweyî bê danin: bi armanca afîrandina zimanekî yekgirti
14. Li ser avakirina komisyonerke ji bo wergerandinê dê bê rawestandin
15. Li ser capemeniya Kurdi û pêsxistina wê tê rawestandin
16. Girêdanen rîexistin di nava YRWK'ê de
17. Standina bîryaran
18. Hilbijartina Komiteya Karger
19. Girtin.

Aligirê Dursun**Karataş têne tecrîtkirin**

Rêxistina Devrimci-Sol, ji demekê ve ye li hember komek ku li hember serokê rêxistinê derdikevin, êrîsên dijwar didomine. Heta niha, di êrîsên bi vi rengi de bi dehan kes birîndar bûne û çend jê ji hatine kustîn. Roja 21'ê Heziranê ji êrîseke bi vi rengi hate kirin. Aligirê Dursun Karatas, bi ser kovara aligirê Bedri Yağan ve girtin û gullebaran kirin. Di vê êrîsê de 2 jê giran 7.kes birîndar bûn.

Kovara aligirê Bedri Yağan Devrimci Cözüm, li ser vê êrîsê beyanek da û hizba Dursun Karatas protesto kir. Kovar ji bo soreşger xwîna hev nerêjin bang li hemû rêxistinê cep kir û ali-giri xwest. Li ser vê nûnerên 14 kovarên cep li hev civiyan û beyaneke hevpar wesandin. Di vê beyanê de êrîsên ser soreşgeran tê protestokirin û ji bo êrîsên bi vi rengi rawestinîn, bang li aligirê Dursun Karatas tê kirin.

Li aliye din, nûnerên kovar û rêxistinê cep dan xuyan ku, bi rêxistinê ku xwîna soreşgeran dirêjin re, dê hemû têkili û danûstandin bêne bîrîn.

Grevê girtiyê Bûcayê di roja 28'an de

Gрева bircibûnê ya ku li Girtigeha Bûcayê ji aliye 63 girtiyê sivasi ve tê domandin, kete roja xwe ya 28'an. Girtiyê ku di grevê de ne, ji aliye tendurisitiyê (sîhît) ve di talûkeyê de ne û li gor agahiyê ku doktor didin, hin ji wan di sinorê mirinê de ne.

Girtiyê ku nexwes ketine tedawiyê qebûl nakin. Li gorî ku Doktor Yesim İsllegen diyar dike, 17 kes ji van girtivan di rewsa mirinê de ne. Gelek ji girtiyâni ji bi nexwesinê wek zerik û tuberkuloz (jana zirav) ketine. Sazi û komeleyen demokratik ên ku vê grevê disopinin (taqîb dîkin) bang li Wezirê Dadiyê Sevî Oktay kîrin ku, daxwazên girtivan bêne pejîrandin û wezifedaren ku li ser girtivan zîmîn dimesinîn bêne cezakirin. Li aliye din malbaten girtiyâni ji, ji 23'ê meha Heziranê ve li KMM'a (İHDI) İzmirê ketin greva bircibûnê. Dayîkên girtivan bang li dewletê kîrin û wiha gotin: "Mê ew anîn dînyavê û em de wan bi we nedîn kustîn."

Ji bo greva bircibûnê ya li Girtigeha Bûcayê rêxistin, sazi û komeleyen demokratik ên navîneteweyî ji, di dewre de ne. Rêxistina Efîyê ya Navneteweyî, birvara liybazîyê girt. Li gor vê birvarê de bi faks û telefonan serokkomar, serokwezîn û wezirê dadiyê bêne protestokirin.

Serokê Partiya Demokrasiyê (DEP) Yaşar Kaya:**'Em mecbûr in ji her aliyî ve bixebitin'**

Serokê Partiya Demokrasiyê diyar kir ku, hemû amadehiyên xwe ji bo karîbin bikevin hilbijartînê herêmî û giştî qedandine û li 44 bajaran xwe bi rê xistine. Kaya, der barê cihêtiya HEP û DEP'ê de jî peyivî û da xuyan ku HEP'ê bes xwestiye ku gelmeseya Kurd bêqedexebûna were peyivîn, lê DEP, ji mafê çandî bi heta mafê federasyonê ji bo Kurdan xwestina wan ji xwe re kiriye armanc.

Ji bo rojnameya me Serokê Gisti vê Partiya Demokrasiyê Yaşar Kaya hin beyanat dan. Yaşar Kaya der barê avakirin û birêxistina DEP'ê de pirsa me bersivand û da xuyan ku bi awayekî lezgîni xebatêni xwe yên rêxistinî temam kirine. Kaya: "Niha di 27'ê mehê de kongreya me ya mezin heye, li gor qanûnên ku em mecbûr kîrine xwe bi rê bixin. Li 39 bajaran, me li 44 wilayetan teskilata xwe temam-kiriye. Li gorî qanûnên hilbijartînê me hemû tîstên xwe anîye cih."

Serokê DEP'ê Kaya li ser armanca partiya xwe ji sekînî û wiha got: "Em Kurd mecbûr in di platformen demokrasiyê de bixebitin. Ji ber vê yekê ji, ji me re partiyek lazim e. Hün dizanin partiya me ya dinê (HEP) dewletê ew daye mehkemeyê. Ku ew ji destê me here em nikarin car din di platformen demokrasiyê de bixebitin. Hilbijartina belediyan û mebûsan li pêsiya me heye. Em dixwazin dengê gelê Kurd bigîhînin meclîsê.


Lê belê em dizanin ku, heta

niha Komara Tirk a ku li ser mîrasa Osmanî ava bûye sê tiş hel nekirine. Yek, demokrasiyê nekiriye jiyana herkesi, meseleya Kurd û demokrasiyê û istismara li ser karker û xebatkar. Heta ev her sê tiş çareser nebin, li Tirkîye demokrasi cênabe."

YEKİTÎ Û BIRATIYA KURDAN FERZ E

Yaşar Kaya li ser rengê DEP'ê yê siyasi rawestiya û da xuyaniyên xwe wiha domand: "Ev ji heye, em ne partiyek doktrînel in. Li pêsiya me xebateke doktrînel tune. Em partiya xelkê ne, a xebatkaran e. di nav partiya me de hem gun-di û xebatkar, hem demokrat û ronakbîr û hem ji dewlemdîn welatparêz hene.

Em dixwazin çawa li derive partiyen Kurdan mil dan hev, cepheyeke Kurdistanî çekirin, em ji li hundir cepheyeke wisa çebikin. Ku em neyêne cem hev em nikarin tu karî bi pêve bibin. Yekîti û biratiya Kurdan ji bo me gelek elzem e. Ji bo me êdi ideolojiya cînî (sinifi)

**Serokê Giştî vê Partiya Demokrasiyê (DEP) Yaşar Kaya**

Wêne: Salih Günbat

tune. Heta ku Kurd tev neyêne cem hev nikarin bigîhin mexsedên xwe."

JI MESELEYA KURDİ BEHSKIRIN JI PARA VE MAYE

Pirsa me ya cihêtiya navbera HEP û DEP'ê ji wiha bersivand Serokê Partiya Demokrasiyê Yaşar Kaya: "Di nav hemû partiyan de ferqî hene. HEP ji bo me gava pêşin bû. HEP'ê di programa xwe de wiha digot: "Em dikarin wisa bîkin ku, meseleya Kurdi bêqedexebûna were ifadekirin û jê bê xeberdan." Lé DEP dibêje êdi ji meseleya Kurdi behskirin û jê xeberdan ji para ve maye. Ji iro pê ve em dikarin heqên Kurdan bixwazin. Heqên Kurdan ci ne? Heta niha Kurd bi navê xwe nehatine naskirin. Em dixwazin herkes me, bi navê me binase. Xevnî wî tu heqên me yêñ insanî tu nîn in.

Radyo, televizyon, dibistan, weşanên bi Kurdi. İro em dikarin wan bixwazin. Yanê ji xwestina heqê candî ta federasyonê, em dikarin gelek tisan bixwazin."

Ji pirsa, "Di sert û mercen niha de ku şer her dice germtir dibe, pêkanîna armancen we cîqas mimkûn e?" re ji vê bersivê da: "Niha em Kurd mecbûr in li her ali bixebitin. Hinek ji aliye ser in, hinek ji aliye demokrasiyê ne, hinek ji aliye çandî ne. Em geleki bindest in, em mecbûr in ku, ji her aliye ve bixebitin. Car carina ser bi pêve dice. Én ku bi hev re ser dikin ew derdikevin hemberi hev. Mîna dewlet û PKK'ê. Carina ji astî tê, vêca partiyen demokrat dertên pê. Dibe ku nîv saet bi sun ve ji ev wezife bikeve ser milen me. Divê em her tim bi hazırî bin."

Heppevin:
Zana Farqînî

Mayîna Hêza Çakûç ji nû ve dirêj bû


Navenda Nûçeyan- Dirêjkirina mayîna Hêza Çakûç a li bakurê Kurdistanê ji nû ve di Meclisa Tirk de hate dirêjkirin. Hêza Çakûç (Provide-Confort 2) ji bo parêziya basûrê Kurdistanê ta paralela 36 an, li bakurê Kurdistanê hatiye bicihîrin û bîryara mayîna wê ji 6 mehan carekê di meclisa Tirk de, tê rojêvî û bi dengê mebûsan ji bo 6 mehîn din ji tê dirêjkirin.

Her cîqas bîryara mayîna Hêza Çakûç bi fermâna Amerika tê standin û mebûsan meclisa Tirk dengê xwe li gorî vê fermânî diavîjin ji, her cara ku ev mesle dikeve rojêva meclîsê, dibe malzeme ji bo politika hundîrin û her parti dengê dana xwe ya ji bo dirêjkirin, li hember hikûmetê ji bo bazariya

berjewendiyen xwe bi kar tîne.

Serokê Gisti ya DYP'ê Tansu Ciller ku, hê hikûmetê dana niye, bi lez bîryara mayîna Hêza Çakûç ji meclîsê derbas kir. Lewre dibû ku hinêni li hêviya wezirbûnê yan hin berjewendiyen (menfaet) seksî ne, bi avakirina hikûmetê re xweskîn xwe bi dest nexin û dengê xwe li gorî daxwaza hikûmeta neavêjin. Tansu Ciller kîriye ku, herkes bi hêviya tiste-ki li benda avakirina hikûmetê maye. Di vê rewsê de ji hemû daxwazên xwe tîne cih û dixwaze ji vê fersendê istifade bi ke.

Partiyen ku ne di hikûmetê de ne, bi vê yekê dizanin û naxwazin Tansu Ciller zedetir xurt bikin. Ji ber vê yekê ji Serokê ANAP'ê Mesut Yilmaz tû



**Wisa xuya dike ku hêza cakûç hîna bi salan ji Kurdistanê dernakeve.**

yê Refahê Necmettin Erbakan ilan kirin ku, dengê nadîn direjkirina mayîna Hêza Çakûç û di dengandanê de vê bîryara xwe anîn cih.

Bi dengê DYP û SHP'ê, bîryara mayîna Hêza Çakûç ji meclisa Tirk derbas bû û Hêza Çakûç dê 6 mehîn din ji li herêmê karîn xwe bidomine.

Fevzî Bîlge:

‘Gel di berhemê min de xwe dibîne’



Wênekar Fevzi Bîlge, di tabloyen xwe de bi giştî jina Kurd bi awayekî folklorik bi kar tîne.

Fevzi Bîlge pêşangeha xwe ya ferdî ya duyemîn disa li Navenda Çanda Mezopotamyayê vekir. Pêşangeh di 19'ê meha Heziranê de vebû, dê heta 4'ê Tîrmehê bîdome. Di vê pêşangehê de 21 wêne û 11 peyker (heykel) cih digirin.

Wênekar Bîlge heta niha bi tenê li ser wêneyan xebatên xwe didomand û di xebatên xwe de rengên vekirî û germ bi giranî bi kar dihanî. Her wiha temayên xwe ji, ji mijarê otantîk û rewşa gel a niha hildibijart. Di cerîbîna wî ya yekemîn a peykeran de ji ew temayên ku di wêneyên xwe de bi kar dihanî balê dikişande ser xwe.

Bi vê mebestê me di de-

ma gera pêşangehê de çend pirsan jê kir. Ji pirsâ me ya, “Bi taybetî temayên we jin in, çima?” re, vê bersivê da me: “Pîrekên Kurd xweşik in, rengîn in, a du-duyan di dînyayê de ku bisê aliyan ve tê pelçiqandin û zêrandin ew e. Jin zarîf û nazik in.”

Di pirsên me de hat xuyan ku gelê Kurd gelek ji rengên germ û vekirî hez dike. Her wisa wênekar ji vê yekê ser guhê xwe re navêje.

Bîlge li ser bikaranîna rengan digot ku divê neyê wê maneyê wênekarên Kurd rengên din nizanîn.

Pirsâ me ya li ser temayên otantîk û rewşa gelê Kurd a berbiçav ji wiha di-

bersivand: “Armanca bikaranîna temayên otantîk ew e ku em van nirx û hêjahiyyen xwe belge bikin, ji windabûnê rizgar bikin’ e. Bikaranîna rewşa gel a berbiçav ji peywîreke ronakbîrîtî ye. Divê ku ronakbîr, hunermend di berhemên xwe de rewşa gel bi kar bîne, bide xuyan.”

Tê zanîn ku gel eleqeyeke mezîn bi pirranî nîşanî xebatên hunerî nade. Ji ber hînbûna vê rewşê me jê vê pirsê kir.

—Gel eleqeyeke çawa nîşanî xebatên we dide? Me got gel lê mebesta me ji vê peyvê ewe ku kesen tê serdana pêşangehê.”

Eleqeya gel herdu rojên pêsin gelek bû. Zêdetir ji, ji

peykeran re hebû. Di nava kesen ku têr dîtina xebatên min de ji her cîn û tebeqeyî hene. Her kes xwe di xebatên min de dibîne. Xwe hem di berhemên min ên otantîkî de û hem ji yêne ro-

jane de dibînîn.

Mînak pîrekek hat pêşangehê. Gelek bala wê kisand. Di eynî rojê de çar carê din tevî cîranîn xwe ve hate pêşangehê. Ev yek ji bo min xelata herî mezîn bû.”

Gola Wanê

Gola Wanê gola mezintirîn a Kurdistanê ye.. Aqara wê 3.764 km² ye. Ew 8 km li rojavayê Wanê dikeve. Bilîndiya wê ji deryayê 1646 m kûrtîrîn cihê wê ji 100 m. ye. Şîklê wê kêm û zêde 3 gosehi ye. Dirêjahiya golê di navbera Tetwan û Cemê Behdinanî de ketiye û bi qasî 125 km ye. Berê wê li gorî cihan ferq dike. Hinek cihan kêmber e û li hinekan ji bi ber e. Gola Wanê weki newaleke devgirtî ye. Ku bi qasî 12.000 km², av di xwe de civandiye. Gol ava xwe ji cend ceman distîne. Ji aliyê bakur ve ji Cemê Zilan, ji aliyê bakurê rojhilat ve Cemê Behdinanî, ji aliyê rojhilat Cemê Res, Cemê Xosabê, ji aliyê basûr ve Cemê Argafê têr û dirjin golê. Ava golê 22 li ser he-

zarî sor e (%22). Ji ber ku gol ji çar aliyan ve girtiye.

Ava golê, bi taybetî besa wê ya bakur germ dibe û germahiya wê ji 20°C an derbas dike. Ji ber sermayê di zivistanê de ava hinek sünêن golê yê teknik (ne kûr) diqerisîn. Ji ber şorbûna ava wê, di gola Wanê de masî piir in. Tenê hinek masiyêن ku dikarin di nava sor de bijîn tê de hene. Di navbera nîvenda bajarê Wanê û bajarokên dorhêla wê de, bi kestitîn (gemî) bîcûk hatîn û cûyîn heye. Li Tetwan, Xelatê, Adîlcewazê, Ercîşê, Wanê, Edremîtê, Gevasê û Resadiyê lengergehêن (iskele) kestîyan hene. Dar û berênen gola Wanê ji ber hebûna hêşînahî û zinar û selan piir bedew e.

Di nav golê de giraveke di-



Dimenek ji Gola Wanê
yekê em wê dihêlin ji bo niviseke din.

Bêrîvana Dêrsimî

Neqîk

Hunermendekî rasteqîn qeydeyên
ku ji mêt ve hatine diyarkirin
naşopîne.

E. H. Gomrich

Cerdevanê Beho Axa û siya kerê

Min divê ji we re serpêhatiyeke ku li serê Beho Axa yê Qerekîsê û şivanê wî hatiye binivisim. Beho Axa sercerdevanê gundê Duvayê ye. Gundê wî di navbera Diyadinê û Qerekîsê de ye. Cerdevanê wî, hînek jê şivanêne pezê wî ne. Nêzîkî hezar pezê Beho heye. Çar penc şivanê wî hene.

Şeveke tava hivê ye, şivan ji xwe re kom bûne rûniştine. Kerê wan şivanatê, serê hêswê. Sivan çav, pê dikevin û xwe diavêjin erdê. Ker ji di cihê xwe de sekiniye. Guhê xwe her çikas dilivîne û siya guhêne wê dikeve ber çavên şivanan dibin çen kes û hema penc şivan destê xwe radikin hewa. Dibêjin: "Em teslim, em di bextê Kurdistanê de ne, hûn me ne kujin. Bi sozê namusê hûn vê carê me efû bikin, ji iro pê ve em hew radihêjin tivingê dijmin." Bi dû re dinêrin ku wa ye kerê wan e û her penc şivan ji hev re dibêjin: "Ev jiyana me, jiyaneke bênamus e. Yan na em ji siya kerê xwe hevqas nedî-



welat

bizdiyan." Û ji hev re dibêjin: "Kuro hevqas me soz û pêymanê mezin dan ku em ji vê soza xwe dagerin em bênamus in. "Û di nava hevde sond dixwin dibêjin ji iro pê ve em vî îşî nema dikin" Serê sibehê qasideki disyînin ji Beho Axa re. Dibêjin: "Bi telbê

pezê xwe ve, êdî em şivanatiya te hew dikin." Heta zilamê axa têne ba pez, ew ji radihêjin tivingê xwe û derdi Kevin ciyê ji nû ve dest bi jiyaneke binamus û bise ref dikin. Xwe ji wê jiyana pîs û bigemar xelas kirin. Weyl li halê Beho Axa bê.

Eloyê Serhedî

Doğan Güzel**Jûjî...**

* PİSTİ WÊRANKIRINA GUNDÊ BANEYÊ YÊ ŞIRNEXE Û İŞKENCEKIRINA
GUNDIYAN VÊCA LI DADEHA EWLÉKARIYA DEWLETÊ (OGM)
TEN MAHKEME KIRIN.

**TÎR**

Musa Anter

Ji bo bîranîna apê Musa

Nivîskar û mamoste, rojnamevan û şervanê doza Kurdistanê. Ebûqatê heqiyê, rewşenbîrê herî mezin Musa Anter. Ji hêla xwînmijê hîzb-î kontrayê dewleta Tirk ve, li bajarê Amedê hate qetikirin.

Musa Anter kevokê aştîyê bû, her weke ku em pê dizanin biratiya gelê Kurd û Tirk diparast. Ez Nuriyê Diyarbekirî, li Fransa û li ser navê Kurdê li Fransa dijîn dewleta Tirk protesto dikim û dibêjim. Bila dewleta Tirk baş bizanibe ku, heta Kurd li cihanê bijîn hemû şehîden Kurdistanê û Apê xwe Müsa ji bir nakin. Şehîdbûna Apê Müsa û kuştina zarokekî me ji me re mina jana zîrav û birîna me hin pê kûr dibe. Lê bila neyarê me bizanibe em tol û heyfa Apê Müsa û heyfa şehîden xwe yên dinê li erdê nahêlin. Pênuşa Apê Müsa bi dilekî xweş û bi evîna welat digirin destê xwe.

Apê Müsa tu rehet rakeve. Ew xwîna te ya rîjiyayî roj bi roj sor veke agirê Newrozê hilorî. Ji nav bajar û gundan heta serê çiya, her der veketî, ronahî daye welat. Keç û xortê Kurd hemû li gaziya te hatin. Wê neyarêne xayîn, di agirê te de bişewitîn.

Daxwaziyek min ji gelê Amedê heye û ez bawer im wê bînin cih. Şûna Apê Müsa lê şehîd bûye em naxwazin bibêjin Seyrantepe. Her wiha ji iro pê ve em dixwazin navê wî biguherînin.

Em tev bibêjin diyarê Müsa

Qetil kirin qetil kirin
Musa Anter qetil kirin
Ji meytê wî xofê girtin
Dizîn birin defin kirin

Xwîn dirijî xwîn dirijî
Li Amedê xwîn dirijî
Neyar xwînmij û dijwarî
Kal, jin û zorakan dikûjî

Jîn ci jîn i, jîn ci jîn i
Li Amedê jîn evîn i
Bi eşq û evîna welat
Musa ket nav gola xwînî

Çiqas bilind û gir i
Wek çiyayê Agirî
Nivîskar û mamoste
Şervan û rewşenbîr i

Ji bir nakin, ji bir nakin
Em Apê xwe ji bir nakin
Ji bo Kurdistan rengin
Emê canê xwe fêda dikin

Çiqas bilind û xurt i
Wek Zaxros û Ararat i
Nivîskar û dengê Kurd i
Millîtanê kalê xort i

Tu şehîd i tu şehîd i
Apê Müsa tu şehîd i
Xwedîyê pênuşa hêşin i
Tu egitê xaka Med i

Tu namirî tu namirî
Musa Anter tu namirî
Weke agirê Newrozê
Dilê me de venâmirî

Nûriyê Diyarbekirî / Creil / Fransa

Hem rengê têkoşînê, hem jî ber û îmkanên wê ji hemû deman bêhtir û firehtir bûye ji ber vê ye ku:

Ev deng nema tê birrîn

● Lî hember qetlîam û operasyonên ku hêzên dewleta Tirk li Kurdistanê pêk tîne Kûrdêñ welatparêz li dijî saziyên Tirkîyê yên li Ewrûpayê livbazi li dar xistin. Li Munîh 19. li Marsîlya 30 Tirk ji aliye grûbêñ Kurd ve wek rehîne hatin girtin. Li gelek bajarêñ din ên Ewrûpayê jî saziyên Tirkîyê hatin rûxandin. Di dema van bûyeran de bi dehan xwepêşandanvan û polîs birîndar bûn. Ji birîndaran du xorten Kurd mirin.

● Gelê Kurd li hember kirinêñ dewleta Tirk ên derveyî mirovahiyê bêdeng namîne û her diçe bi awayen cur be cur dengê xwe bilind dike. Li Kurdistanê û Tirkîyê bî girtina kepeng û kontaxan li Ewrûpayê jî livbaziyên li dijî saziyên Tirk gelê Kurd reaksiyonê nişan dide. Bi vi şeklî hem hemû gelê Kurd vedixwîne wan warê têkoşînê, hem jî bala raya giştî ya dinyayê dikîşinê ser hovîtiya ku hêzên dewleta Tirk li ser Kurdan diceribîne.

Navenda Nûçeyan- Li hemû welatên Ewrûpa, alîgirêñ PKK'ê û welatparêzên Kurd li dijî operasyonên ku artêsa Tirk li Kurdistanê bi awayekî hovane dimeşîne, girtin ser balyozxane, ofisên balefirêñ Tirk, banka û ajanşen tûrîstîk ên Tirkîyê. Di çalakî û livbaziyên xwe de xwepêşandanvanen Kurd li Munîh nozdeh, li Marsîlya jî sîh kesen Tirk demeke dirêj rehîn girtin.

Roja 24'ê Hezîranê, Kûrdêñ ku li Ewrûpa dijîn, li Almanya li bajarêñ **Munîh, Frankfurt, Berlin, Munster, Dortmund, Hanover, Koln û Bremen;** li Swîsrê li **Bern, Zürich û Cenevre;** Li Îngilîstanê li **London;** li **Fransa** li **Marsîlya û Liyon;** li Swêdê li **Stokholm;** li Denmark li **Kopenhag,** gelek balyozxane, ofisên balefirêñ Tirk, banka û acanteyen tûrîzmê yên dewleta Tirk îsgal kirin. Li hin van avahîyan wezifedarên dewleta Tirk rehîn hatin girtin.

Li balyozxane ya Marsîlya 30 Tirk pêvajoya sê saetan li Munîh jî pêşî 19. dû re kes pêvajoya 10 saetan di destê bizavanen Kurd de rehîn man, du re serbest hatin berdan. Di dema van livbaziyan de ji Kurdan û polisan bi dehan kes birîndar bûn, ji Kûrdêñ birîndar 2 xort mirin. Yek ji wan, bi berekêñ memûrêñ Tirk ê li balyozxane ya Bernê kar dike, hate kuştin. Li ser kuştina vî xortê 19 salî. Kûrdêñ ku xwepêşandan li dar xistin, wiha peyivîn: "Bi destê konsolosê Tirk gulebarankirina

ser mirovîn destvala karakterê dewleta Tirk derdixe meydanê. Li Kurdistanê, her roj iñsanen me têñ qetilkirin, çiyayen me têñ bombekirin, dengê tu kesi dernakeve. Li hember vê helwesta konsolos a derveyî mirovahiyê jî, dengê kesi dernakeve. Divê ku dinya hemû lomanan ji vê helwesta konsolosê Bernê bike.

MUNÎH

Li gelek bajarêñ Almanya Kûrdêñ welatparêz bi ser avahîyen dewleta Tirk ve girtin û jî aliye daringî ve zirarekî mezin dan van avahîyan. Büyera herî mezin û girîng li Munîhê qewimî. Grûbek Kûrdêñ welatparêz parêzkeren Konsolosxane ya Tirkîyê ya Munîh bê tesîr kirin û Tirkêñ di hundir de rehîn girtin. Armanca vê livbaziya xwe ji hundirê balyozxoneyê wiha diyarî dewleta Alman kirin: "Em dixwazin ku Serokwezîrê Almanya Kohl dev ji helwesten xwe yên duali berde û dewleta Tirk jî ber

pestên ku li hember Kurdan pêk tîne protesto bike. Kûrdêñ bizavkar ji 19 rehîneyan, neh hebêñ jin û zarak saet li dora 10'an berdan bizevkar piştî ku bi parlamentereki Alman re peyiñ saet li 12'ê şevê dev jî livbaziya xwe berdan û deh rehinêñ di destê xwe de serbest kirin.

Li Bremenê, ofîsa balefîra Tirk li Munsterê konsolosxane ya Tirkîyê, li Köln, Frankfurt, Dortmundê jî gelek bankayen Tirk ji aliyeñ Kûrdêñ welatparêz ve camen wan hatin şikandin û eşyayen wan konsolosya Tirkîyê protesto kirin.


MARSÎLYA

Li bajarê Fransa, Marsîlya grûbek xorten Kurd balyozxane ya Tirkîyê îşgal kirin û 30 Tirkêñ di hundir de rehîn girtin. Piştî ku daxwaza wan bi televizyonekê re hevpeyvin hate cih, rehîneyen di destê xwe de serbest berdan.

Li paytexten Îngilistan,



Polîsên Fransiz li bajarê Fransa Marsîlya, li ber dergehê Konsolosxane ya Tirk.



Li ber konsolosxane ya Tirk a Bonnê protestovanen Kurd û polîsên Alman hev digijigîjin.

Danmark û Swedê jî gelek bankayen Tirk ji aliyeñ Kurdan ve hatin tahârikirin û konsolonsiyen Tirk hatin protesto kirin.

Livbaziyên Kurdan, bi taybeti yên li Munîh, Bern û Marsîlya, li Ewrûpa pirr deng dan û di hemû televizyonen Ewrûpa û yên Tirkîyê de wek sernûce hatin dayîn. Di gelek rojnameyan de jî, an di manşetê de an jî di rûpelên yekemîn de ev bûyer hatin weşandin

REAKSIYONA TIRKIYÊ

Li Tirkîyê, kanalên televizyonê bi girîngî her saet nûçeyen van bûyeran pêskêş kirin û ta dawî di ekranen xwe de cihen bûyer li diqewimîn, nîsandan.

Serokkomarê Tirkîyê Süleyman Demîrel ev bûyer bi awayekî tund protesto kirin û wiha got: "Em hêvî dikin ku hikûmeten ku em dost dizanîn ji niha pê ve tedbirê xurt bistînin ji bo parastina nûneriyen me."

Wekilê Serokwezîr Erdal Înönü û serokên partiyen A-NAP, RP, DYP, MHP û gelek mebûsên neteweperest helwesta Kûrdêñ welatparêz protesto kirin û di vê mijarê de dîtinêñ xwe yên hevpar anîn zîmîn û ev mesele wek meseleyeke neteweyî nirxandin.

REHÎNE DI DESTÊ

KURDAN DE

Rehîneyen ku nêzîkî 12 saet di bin kontrola Kûrdêñ welatparêz de man, di dema rehînbûnê de diyar kirin ku.

tu xerabî û hereketen dijwar ji aliyeñ bizavkaran ve li hember wan nehatiye kirin.

Pirekek ji rehîneyan dema rehîne bû wiha peyiñ bi telefonê: "Yekcar li dijî me tu tewrîn wan ên xerab nîn in. Hemû pêdiyîn me tînin cih û li hember me samîmî ne.

DAXUYANIYA KOMİTEYÊN KURDISTAN

Li ser bûyêrên ku li dijî dewleta Tirk li bajarêñ Ewrûpa qewimîn, komîteyên Kurdistanê daxuyaniyek belavkir. Di belavokeê de ev livbazi maftar têñ dîtin û dewleta Tirk ji ber tewrîn xwe yên barbar tê rexnekin. Belavok bi kurtî cih dide wan nêrinan: "PKK'ê ji bo çarsikerîna pîrsa Kurdi bi riyen astîwaz, ji 20'ê Adarê ve şerrawestin îlankir. Ev pêvajo bi awayekî yekali 83 roj dom kir. Lê tevi vê yekê, dewleta Tirk êrişen xwe domandin û dev ji ser berneda. Bi vê helwesta xwe dewleta Tirk, ji riyen siyasi yên astîwaz zêdetir metodên leskerî yên terorist diecibîne. Bi taybeti, di vê meha dawî de terrora dewletê bi awayekî eşkere didome.

Dewleta Tirk êdi bêvesartîn, gundan hildiweşine sivîlan diktûje. Di vê meha dawî de, 50 gund hatine hilwesandin, ji sedî zêdetir inşanen Kurd hatine qetilkirin û bi hezaran ji Kurd hatine girtin. Ev bûyeren ku li Ewrûpa qewimîn li dijî vê helwesta Tirkîyê em wek reaksiyona Kurd dinirxînin."

Enstituya Kurdi bulten derxist

Enstituya Kurdi ya li Stenbolê beri ve bi salekê di 18'ê Nisana 1992 yan de di bin serokatiya Dr. İsmail Beşikci û tevî Musa Anter ji aliye 8 rewsenbirên Kurd ve hatibû damezirandin. Pisti sala wê qediya bultenek weşand. Bulten bi arananca ku raya giştî, bi taybeti ji kesen ku bi warê Kurdojîyê ve eleqedar dibin agahdar bibin, diwese. Hejmara yekemin 8 rüpel e û bi zaravayê Kurmanci hatiye nivisîn. Serokê Rêveberiya Enstituyê Sefik Beyaz diyar dike ku, di pêşerojê de wê ev bulten bi zimanê Tirkî û Ingilizî ji bê wesandin. Enstitu bi kongreyekê endamên xwe yên rêveberiyê ji bijart û dest bi xebatê xwe kir. Di programa enstîtuyê de ji weşana pirtûka alfabetê ta bi ferheng û zedekirina saxên enstituyê projê hene. Pirtûka alfabebla Kurdi ku wê ji 215 rüpelan pêk were li ber capê ye.

Enstitu ji bo bipêsxistina xebatê qada candê bi Kurdistana Başûr re dikeve têkîlî û danûstandinan. Di programa pêşeroja Enstituyê de xebatek gîring ji, bi pêsxistina her zaravayê Kurdi ye. Niha bi pirrani li ser Kurmanci tê xebatandin, lê hin bi hin ci Soranî û ci Dimîlî wê li ser van zaravayan ji bi kûrahî bê sekinandin.

Armanci di dawî de bi xwezayî yekkirina zimanê Kurdi ye.

Ji dema ku Enstitu vebûye heta niha, gelek astengi jê re cêbûne. Roja vebû polisan lewheya navê wê ji diwar daxistin, demek sün ve êrisi Enstituyê kirin, dest danin ser arsiva wê. Di vê navê de damezrenêrê wê Musa Anter hate kustin. Lê Enstitu li hember hemû këmasi û astengiyan bi imkânîn heyi xebatê xwe domand, vêga ji wê her meh bi vê bultenê eleqedaran bi xebatê xwe agahdar bike.

Partiya DEP'a Bursa di binçimîkerdis

Partiya DEP'a Bursa 21'ê Heziranê di ser keyê 30 merdiman girati û bê sebep kerdi binçimi.

Partiya DEP'a Bursa beyanê da beyan di. Emniyeta Bursa qandê plana xwi yê verîna hadirkerdê û seva 21'ê Heziranê kuçê Yavuz Selim, Telefîrik. Soganhî. Emek di serê keyî DEP'i jan girofî û 30 endamê cînan giroti binçimi ë ku binçimî namî inan:

Ramazan Sönmez, Necmettin İmel, A. Aziz İmel, Cevdet Hatun, Resul Baykara, Cindi Toprak, Hamit Toprak, Mahsur Toprak, Cemal Koc, Ata Celik, û birayacî Muhlis Isik, Cemal Odabasi, Faysal Yâsli Necdet Yilmaz, Metin Celik. Girotina endamanê DEP'i jan qandê verniya xebatê cînan bigirê û hewna xebatê cînan hadirey do bixeripnê.

Di nav rêexistinê Kurd de riya yekîtiyê vebû

Ji bo cephê civîna dîrokî

Navenda Nûçeyan- Rêexistin û partiyen bakurê Kurdistanê, di 18-20'ê Heziranê de li Ewrûpa civîneke dîrokî pêk anîn û bîryara avakirina eniyeke neteweyî girtin. Partî û rêexistinê ku di vê bîryara dîrokî de cih girtin, bi beyaneke hevpar dan xuyan ku, ji bo avakirina eniyeke neteweyî, bi berbiçav kirina şertên iro, di dîroka Kurdistanê de rûpelek nû hate vekirin. Li gor daxuyaniyê ger politikayê TC'ê yên îmha-kirinê wiha bidomin dê berxwedaneke giştî û hevpar bê lidarxistin.

Bi bîryara şerrawestina yekali ya PKK'ê, di navbera rêexistin û partiyen Kurd de ji xebatê yekîtiyê dest pê kiribûn. Cara pêşin di nava hin rêexistin û partiyen Kurd de protokolên giring hatibûn îmzekerin. Protokola yekemîn di navbera PKK û PSK'ê dê pêk hatibû. Dû re PKK, Hevgirtin-PDK û PRNK'ê ji protokol îmze kiribûn. Bi van xebatê ji di dîroka Kurdistanê de, ber bi yekîtiyê ve rûpeleke nû vebûbû.

Pistî vê civînê hemû rêexistin û partiyen bakurê Kurdistanê beyaneke hevpar weşandin. Beyan bi kurtî wiha ye: "Hêviya gelê me ya mezin, berbihevhatina hêzên siyasi yên bakurê Kur-

distanê pêk hat. Ev rêexistin me yên siyasi roja 18-20'ê Heziranê li hev civiyan û ji bo avakirina eniyeke neteweyî, bi berbiçavkirina dîroka me û roja iro rûpeleke nû vekirin. Hêzên neteweyî ne bi gumanen rêexistin, lê bi yên neteweyî liviyanê. Hêzên siyasi, li gor rasteqîna dîrok û gelê me ji bo yekîtiyê û ji bo vê yekîtiyê bi eniyeke neteweyî bixemîlinin bi dîtineke hevpar bîryar girtin. Rêexistin me yên ku bi wateyeke wiha manidar, bi bîreke wiha kûr û bi hisen berpirsiyariyê tevger dikin, dest bi amadekariya avakiri-

na eniya neteweyî kirine û karêne wê li hev parve kirine.

Ev yekîtiya bi eniyeke garantia tékoşin û serfiraziya me ye, pişti dawîlêhatina amadekariyan û di demeke nêzîk de, dê ji raya gisti û gelê me re bê ilankirin.

Em di vê roja dîrokî de, bang li dewleta Tirk'ê dikin ku, dev ji êrisen hovane û bêqayde berde û riya dialoga siyasi û careserkirina bi aştî veke. Banga me li hemû dînyayê yê ku, li hember politikayê Komara Tirk'ê yên îmha-kirinê rawestin û ji bo şerrawestineke dualî xebatê bikin.

Ger tevî vê yekê Komara Tirk politika xwe ya înkârî û îmhayî bidomîne, ji me re riya şer ji té de hemû celebén tékoşinê vedibin. Em ji niha ve diyar dikin ku, rewsa dewleta Tirk'ê wiha bidome, dê berxwedane gel mezintir û dorfirehtir bibe. Emê ji berxwedaneke bi gisti û ser bilind bikin. Qet guman nîn e ku, ji niha pê ve ji berpirsiyare xwîna ku dê bê rijandin û eşâ ku dê bê jîndin ji Komara Tirk be."

Rêveberiya taybetî dîsa dirêj dibe

Ev nêzîkî deh sal e ku li Kurdistanê rêveberiyâ taybetî heye. Di vê demê de tékoşîna neteweyî rawestin li aliyeke, hîn xurttir bûye. Dewleta Tirk a ku bi metodên leşkeri dixwaze dengê gelê Kurd bibire û riya azadiyê lê bigire, di vê demê tê negîhiştiye armanca xwe û zirarê mezin daye ekonomiya xwe, lê xuya ye ku hê ji têne gihiştiye ku ev ne çare ye.

Navenda Nûçeyan- Rêveberiya Taybetî ya ku di bin koordinasyona waliyê herêmî de li pirraniya bajaren Kurdistanê tê mesandin, bi daxwaza Heyeta Ewlekariya Dewletê (MGK) ji nû ve ji bo 4 mehan tê dirêjkirin.

Weke tê zanîn, hikûmet di dema şerrawestinê de sozê râkirina rêveberiya taybetî dabû. Lê pistî ku hikûmet bersiveke erêni neda bîryara şerrawestinê û êrisen xwe domandin şer ji nû ve dest pê kir, dîsa ji vê sozê xwe vegeleya. Tevî vê,

ji bo ev sistem rabe, li pey, sistemeke nû digeriyan û ji bo vê ji careya zedekirina rayeya waliyên li herêmê dane ber xwe.

Li gorî vê sistema nû, rayeya waliyên herêmê tê zedekirin û qanûnê rêveberiya bajaran tê guherîn. Weki din, di nava ordiyê de ji hin guherîn çedîbin û cendirme di bin emrê serleskeriya wali û serleskeriya cendirmeyan de têne koordinekirin. Bi vî awayî ji li herêmê tu hikmê otorîteya navendi ya sivil namîne û he-



Waliyê Rêveberiya Taybetî, ji waliyekî zêdetir di nav tewrên generalên leşkerî de ye.

mû raye di destê leşker û waliyan de dicivin.

Guherînê ku di rêveberirina Kurdistanê de pêk tê, ji aliye hikûmetê ve weke reformekê tê nîşandan. Lê di rastiyê de şertên rêveberiyê hê ji berê ji dijwartir dîbin û ji bo gelê Kurd rojê hê ji xerabtir dest

pê dikin.

Ji bo 4 mehîn din ji dirêjkirina rêveberiya taybetî, partiyen din ji destek didin, hikûmetê. Bi vî awayî ji ferma HED (MGK)'ê tê cih û ev sistema antîdemokratik dê hê demeke gelek dirêj li Kurdistanê hikmê xwe bidomîne.

Ji ARGK'ê bo Şîrnexîyan: 'Şîrnexê vala bikin'

Navenda Nûçeyan- Di van rojê da-wî de li Kurdistanê şer, ji her demê bêhtir xurttir dibe. Dewlet li hember şerrawestina ku PKK'ê dabû destpêkirin, tu gavêne erêni neavêt. Dixuye ku, wê navêje, dixwaze gund û bajaren Kurdistanê bike 'kela hemberi şoresê'. Dewlet bi taybetî ji li Şîrnexê bi sedan leşker û cerdevan civandine û Şîrnex kiriye 'bajaren leşkeri'. Li ser vê yekê Serleskeriya Qe-

rageha Eyaleta Botanê ya ARGK'ê (ARGK Botan Eyalet Karargah Komutânlığı) daxuyaniyek belav kir, li Şîrnexê. Di vê daxuyaniyê de ARGK wiha bang dike: "Dixuye ku wê dewlet qetliamên nû li Şîrnexê çêke. Li ser vê yekê partiya me qerâren valakirina Şîrnexê standîye û gerek e Şîrnex bibe 'Meydana Cengê ya Serbest'. Cawa ku mîtingehkar û dagirkeran li vê derê jiyan jehr kirine ji gelê

me re, gerîla ji, ji iro pê ve wê vî warî bîke dojeh (cehnem) ji bo hêzene dijmin û çeteyen xayînan. Ji bo vê ji partiya me bang dike: yê ku destê wan karin çekan bigirin bila derkevin serê ciya, yê ku nikarin ji bila di nav sînorîn bajêr de bi cih bin." Daxuyanî wiha xelas dibe: "Heta niha mirovênu ku alikariya dewletê kiriye yan divê teslimê ARGK'ê bibin yan ji, bila ji Kurdistanê derkevin."

PÊNÛS

Amed Tigris



Dînamîtkirina gora Mem û Zînê

Me cend roj berê filmê Mem û Zînê hem bi Kurdî û hem jî bi Tirkî di TV'de temâse kir. Xwezi me temâse nekiriba! Bi zanabûn an jî bi nezanî mirov incax dikare berhemeye Kurdan a klasik û herî hêja hewqas bihermine û zerar bidê. Mem û Zîn an jî Memê Alan şaheser, tac û serkaniya edebiyata Kurdan e. Lî; hezar mixabin di film de ev tac û şahesara Kurdan xistine bin lingê xwe, gemar kirine û herimandine. Senaryoya film % 90 ji orjinala berhema Mem û Zînê hatiye dûrxistin. Mítoloji an çiroka Mem û Zînê li ser cend faktorêng bingehîn hatiye avakirin: Hêzbûn û serxwebûna Mirê Botan, xweşbûn û dewlemendiya xwezaya (natûra) herêmê, edet û toreyên gelê me, evindarî û dilovaniya Kurdan dide diyarkirin. Ev hemû di berhema Mem û Zînê de bi awayekî hunermendî û edebî di nav hev de hatine honandin û neşkirin.

Hezar mixabin di filmê Mem û Zînê de ev faktor û nişanên bingehîn yek bi yek hatine tahrîfkarin. Di destpêka film de ku dixwazin Newrozê pîroz bikin, tahrîf dest pê dike. Pirzirkirina Newrozê wêki destpêkirina Olumpiyada Yewnanistanê yên kevin bi

meşalan dest pê dike. Di film de Mîrê Botan weki muxtar an jî axayekî gund e. Mirov nizane ku ew Mîrê Cizirâ Botan e. Xwedî xwe ye. Lî, di film de weki bajarı an jî gundiyeke belengaz û xizan e. Mala wî koxika mirışakan e. Mala gundiyeke jî ya wî spehitir e. Di şikeftên Hesenkeyfê de filozof kew xwendî dike. Jina ku di rola navmalî û navcîtiye de dilize, ew weki jinêne Kurd ên herêma Herranê dest û rûyê xwe deq dane. Bûkê ku hene dîkin li ser Bingolê û stranen dibêjin. Stranen şînê li dawetê dibêjin. Li Botan folklorra Amedê tê listin. Ma bi folklor û stranen Cizirâ Botan ci bûne? Ji derî yek-du sahneyan kincen Cizirîyan weki yên Ereban in.

Xelk dema bûyerên dîrokî û eserên klasik dîkin film, taybetiyêni jiyana civakî û kulturiya wê demê digirin berçav. Li gor wê demê film cêdîkin. Filmên ku li ser Yewnanistana kevin, Roma, Misir û hwd. cêdîkin wiha ne. Filma Klopætra di vî warî de minakekî berbiçav e. di qesrên mermer de hatiye kişandin.

Memê ji Tacdin jî rebentir û xizantir e. Bêkes e. Dema Mîr peyayêne xwe ve diçe néçirê ew û Zîn jî, di nav bexce de hevdû dibînin. Di vegera Mîr de xwe di bin daran de vedîşerin. Hal bû ku di helbest û çirokê de Zîn xwe di bin kurkê Memê de vedîşere. Mem dewlemend e. Xwedî mal û milk, qesir, qonax û kurk e. Di film de Mem di helbesta xwe de behsa Şîrin û Ferhat, Leyl û Mecnûn dike. Ma-Memê Alan ji Şîrin û Ferhat ne kevintir e? Weki ku tê zanîn Ehmedê Xanî Memû Zîn nivisiye, lê Mem û Zîn ne berhêma Ehmedê Xanî ye. Ew ji orjinala Memê Alan e. Çiroka Memê Alan bi sed salan berî Ehmedê Xanî di nav Kurdan de hebûye. Lî, Ehmedê Xanî di çiroka Memê Alan de guhartin çêkiriye. Bi helbestki nivisiye. Ji wê nivisara xwe ya helbestki re gotiye Mem û Zîn. Nûredin Zaza jî çiroka Memê Alan nivisiye. Hin jî di nav xelkê de cend varyantên Memê Alan hene û di cîvînên zivistanê yên tarî û dirêj de heta berbanga sibehê tê gotin.

Dubaja Kurdi gelekî seyr (ecêb) e. Dengê Zîn, Stî û jinêne din bi Kurdiya Serhedê ye. Heta ne Kurdiya Serhedê bi Kurdiya Tirkî ye. Ji "êvarê" rî dibêje "evar" Devokên her herêmî hene: Mêrdînki, Serhedî, Botîki, Diyarbekirkî....


Xelk dema bûyerên dîrokî û eserên klasik dîkin film, taybetiyêni jiyana civakî û kulturiya wê demê digirin berçav. Li gor wê demê film cêdîkin. Filmên ku li ser Yewnanistana kevin, Roma, Misir û hwd. cêdîkin wiha ne. Filma Kleopatra di vî warî de minakekî berbiçav e. Di qesrên mermer de hatiye kişandin. Yê me di şikefta Hesenkeyfê û di mala muxtar de. Kincen Ereban li xwe dîkin, Kurdiya bi Tirkî diaxivin, li ser henê sfrana "Bingol Şewîti" dibêjin. Mirov dikare bibêje ev zirdînitî û zirnezanti ye! Wax li minê, dinamit xistinê binê gora Mem û Zînê!

Talîsman'a Walter Scott û Kurd

Serefhan Cizirî

Sir Walter Scott (1771-1832) niviskarekî Skotlandî (İskoc) ye. Walter Scott di niviskariya xwe de romana dîrokî ya modern pêş xistiye. Di niviskariya xwe de Walter Scott pîrî caran serpêhatî û mítolojiya ku li Ingilîstanê û Skottlandê hebû, kom kirine. Çirokên ku di nav xelkê de dihatin gotin bi awayekî nû Walter Scott modernize dikirin. Pirraniya niviskariya Walter Scott li ser bûyeren kevnare ava dibe. Romana weke "Ivanhoe" û "The Talisman" li ser bûyerê mítolojik û dîrokî têne avakirin. "Ivanhoe" carina bi navê "Siwariye Reş" jî hatiye çapkirin. "Ivanhoe" bûye film jî. Bê mubarexe mirov dikare bibêje. "Ivanhoe" di edebiyata cihanê de romana siwarî ya herî nasîrî ye.

Romana "The Talisman" carina bi navê "Reşadê Dilser" jî hatiye çapkirin. Reşadê Dilser weke tê zanîn serok û şahê xaciya bûn. Şahê Ingilîstanê Reşadê Dilser ku dibû serokê hemû xaciya li Ewrûpa. daxwaz dikir ku bajare Qudsê ji misilmanan bistîne. Di vê demê de serokê misilmana Selahaddîn Eyyûbî dike û Selahaddîn li cem niviskar dibe sembla siwarîtiye di Dema Navîn de. Walter Scott pîrî bi heyranî behsa esalet, edalet, mîrxasî û comerdiya Selahaddîn Eyyûbî dike. Selahaddîn Eyyûbî di vê romanê de dikeve telek şeklan; bi navê Şerko dibe sâvariyeke jî xelkê, bi navê El Hekîm dibe Hekîm Lokman û dikeve gelek şeklîn



Niviskarekî İskoc, Walter Scott hîna berê du sed salan der heqê civaka Kurd de gelek list di pirtükeke xwe de nivîsandibûn.

din jî. Selahaddîn Eyyûbî bi şeklê curbecur danûstandina bi Reşadê Dilser re datîne. Reşadê Dilser bi xwe heyranê Selahaddîn Eyyûbî ye.

Di vê romanê de tiştek bala mirovan pîrî dikişîne. Walter Scott li ser Kurdan baş tiştan dizane. Li ser mítolojiya Newrozê, li ser problemen Kurden Yezidi, li ser bawerî ya bi şeytan, li ser Ahri'man û li ser eslê Kurdan di romanê de pîrî tişt têne gotin. Bi taybetî siwâbim, lê mixabin ez nizanim!

Li Moskovê 'Kurdistan Report'

Mosko, Welat- Di dawiya meha Gülanê de kovara Kurdistan Report bi Rûsî li Moskovê hate derxistin. Xwediya kovarê Kurdistan Komîte ye, ku navenda wê li Moskovê ye. Di redaksiyonê de Parlamenterê Ermenîstanê Cerkezê Reş, Berpirsiyare Rojnameya Kurdistanê Rustem Bîroyev û Seroka Komela Ronañî Yûra Nabiyev cih digirin.

Kovar di hejmara xwe ya yekemîn de siyaseta Sovyeta berê ya 70 sal li ser Kurdistanê û alîkariya wê ji dewletê dagirkeren Kurdistanê re rexne dike. Her wiha tîne ziman ku, "siyaseta Rûsya ya, iro ji berdewama wê siyaseta kevin

e, ku li ser gelê Kurd tê meşandin. Ev ji cihê mixabinê ye..."

Li ser armanca derketinê, redaksiyon di sergotara kovarê de dibêje: "Bi armanca belavkirina informasyonê li ser Kurdistanê û şoreşa serxwebûn, azadiyê û pêşveçûnên ku di nava civaka gelê Kurd çedîbin. li ser xwendevanê zimanê Rûsî belav dike..."

Kurdistan Report ji du mehan carekê derdikeve, lê wê di pêşerojeke nêzîk de mehane derkeve.

Gelek nivîsên bi nirx di hejmara yekemîn de cih girtine: Diplomasîya Kurdi û press konferansa serokê PKK ya Adar û Nisanê li Lubnanê

û bersiva dewleta Tirk bi ope-rasyonê qirkirin û wêrankirin. Bi pênûs Rustem Bîroyi li ser Meclisa Neteweyî ya Kurdistanî, Çerkezê Reş li ser qehremanê Kurdan Mazlum Doğan, Egid, Rehsan û Zekiye Alkan û Newroz û Etîmoloya Kurdi nivîsandiye.

Dîsa kovar li ser jiyana sehidê yekemîn ê Sovyeta berê Cewoyê Avdal ku ji Kurden Ermenîstanê ye sekiniye. Di gotareke xwe ya din de Cerkezê Reş li ser cografiya Kurdistanê radiweste.

Ji bilî van nivîsên bingehîn gelek nivîs û nûçeyen din ên pêwist û cur be cur hene.

Hejmara rûpelên kovara Kurdistan Report 32 ne.

Edebiyata mitirban

Mirov dikare ji xwe bipirse: ma mitirb û edebiyat? Bi awayekî gisti mirov dikare bibêje ku mitirbêne Kurdistanê ji aliye dîroki ve baş nayêne naskirin. Gotina mitirbî bi sekleki negatif ketiye nav zimanê Kurdi. Ji miroveki re "mitirb" gotin weke heqaret têye qebûkirin. Ji miroveki re "artîst" gotin jî wiha têye famkirin. "Art" bi zimanê Ingilizî huner e û "artîst" hunermend e. Him artîstî û hem ji mitirbî di realité de hunermendi ye, lê di zimanê xelkê de ev gotin, disa ji weke heqaret hatine qebûkirin. Ev yek exlaqê feodalizmê nîsanî mirovan dide.

Kurdan hêdî hêdî dest pê kiriye mitirbêne xwe ji bîra bikin. Pirr caran dîtina rewsenbîran û tevgerên politik li ser mitirban weke dîtina eşîr û feodalên Kurd bûye. Ji vê yekê re pirr sahid ne lazim in. Mitirb weke beşekî ji kevneprestiya Kurdi têne dîtin. Ev yek ji aliye sekli ve dikare wiha bê fêmkirin. Lê di rastiya me ya kulturi de, mitirbî tenê bi serê xwe nabin kevnepresti. Kultura mitirbî beşekî ji kultura xelkê Kurd e. Mitirbêne Kurdistan ji pirr aliyî ve Homerosen modern in. Mitirb, li ser civaka Kurd a kevin, kaniya zanebûnê ne. Mitoloji û dîroka me, bi alîkariya mitirban hatiye parastin û dewlemendkirin. Di dema kevnare de, feodal û esîrên Kurdistan yênu ku ji xwe hez dikirin xwediyê mitirban bûn. Mitirb, di civaka eşîrti de xwediyê cihekî bi taybeti ne.

Mitirb dîrokzan bûn, çîrokvan û müzikvan bûn. Mitirb pir-tukxane û şanogeri bûn. Tistêne ku eşîr û civak li hev radigirin û idelojiya kolektiv pêk dianîn, li cem mitirban peyde dibû. Mitirb kesnama eşîra ji bûn. Mitirb hisê eşîra bûn. Bûyer û serpêhatiya eşîrti, disa bi awayekî dewlemend li cem mitirban hebû. Govendgerî, stranbêjî, sayî, evîndari û ser ji, li cem mitirban hebû. Mitirbî, jiyan bi xwe bûn...

Serefxan Cizîri

Rewşen û rewşen

Kovara Rewsenê hejmara xwe ya 10, a meha Adar û Nisanê ji pêskesi xwendevanê xwe kir. Rewşen di vê hejmara xwe de ji cih daye mijaren cur be cur. Wek xebatêne li ser zimêne, en lêkolineyi, wêjeyî, siroveyi, dirôki û hwd.


Kovar di rûpelên xwe de bi giranî cih daye zaravayê Kurmancî. Di vê hejmara de Soranî. Dimili û du nivîs ji bi Tirkî hene.

Jafar Nijad "Destana Zehak û Feridûn". Gavan Kocer ev wergerandiye Kurmancî, du nivîsene Cemîl Gündoğan yek jê bi Kurmancî "Siyaset û Ronakbirêne Kurd" a din bi Tirkî "Bir Kürt Aydinindan Mustafa Kemal'e Mektup" (Ji Rewsenbîreki Kurd ji M. Kemal re Nameyek). Cemîl Gündoğan di nivîsa xwe yeke-mîn de li ser tekiliya ronakbir û siyasetê radiweste. Nivîsa bi Tirkî ji nameya Celadet Bedirxan e ku ji Mustafa Kemal re sandiye. Name bi her awayî li ser siyaseta kemalist disekeine.

N. Ciyaresh bi nivîsa "Kisik û Kurd", lêkolineke xwes derpêsi eleqedaran dike. Nivîskar A. Bali bi nivîsareke bi Tirkî "Kürt Dilinin Dünya Dilleri İçindeki Yeri (Cihê Zimanê Kurdi di nav Zimanê Cihanê de) cihê zimanê Kurdi di nav zimanane de zelal dike. J. Espar "Ebe Gore Bê Edetanê Ma Zewac" de, roniye dide ser toryeyen (sedetên) me. Nivîsa bi Dimili ye û rézenivîsa du yemin e. Mehabad Kurdi bi Soranî bi navê "Baseki Gisti Derbarey Kurd Le Sovyetî Caran de" li ser rews û jiyana Kurden Sovyeta Berê radiweste.

Nivîsa Amed Tigris "Di Kurdi de Eyleta Bêje. Biwêj û Organêne Mirov" gelek girîng û balkes e. Weki din di rûpelên kovarê de hevpeyîn bi F. Hüseyin Sagnic re, nivîsa F. Hüseyin Sagnic "Zman û Rastnivîs", nivîsa Perdeya Duyemîn a listika Mirin û Jîyan a Sanoya Jiyana Nû û hwd.

Rewşen bi vê hejmara xwe ya dehemîn tavê li tariye direse: Ëdi mirov di nav rûpelên Rewşenê de leçayî nivîsene biqalite tê û jê tamekê hiltine. Lê nayê wê maneyê ku Rewşen édi wateya navê xwe bi gisti bi cih aniye û di warê vatîni û peywira xwe de bi ser ketiye, kemiliye. Rewşen, hinek din ji hewlê bide xwe ji bo rewseniyê.



Lîstikvanê Sanoya Jiyana Nû di dema lîstika 'Generalê Teneke' de têne dîtin.

Generalê Teneke

Şanoya Jiyana Nû lîstika xwe ya bi navê Generalê Teneke di 20'ê mehê de li Navenda Çanda Mezopotamyayê pêşandeyî gel kir. Listika Generalê Teneke dê heta 30'ê mehê bidome. Bes bilî rojên sêsem û pêncsemê her roj lîstik dê ji aliye lîstikvanê Şanoya Jiyana Nû ve bê lîstin.


Lîstika ku ji aliye lîstikvanê Şanoya Jiyana Nû ve bi her alî ve hatiye amadekekin, li ser têkiliyên hêzên dagirker, gel û gerîlayan hatiye honandin. Listik bi awayekî pêkenok e û di şexsê Generalê Teneke de rewşa giyanî (ruhi) yên leşker, serbaz û efserên Tirk dide nişan.

Ji aliye din ve bi awayekî zorahî be ji-lewre di honandina lîstikê de teknîk zêde

ne xurt e- di kesaniya ebûqat de ji kesen menfeetperest, bi gotina gel tirşikçi û hevkar bi kenokî derpêsi temaşevanan dike.

Sahneya darizandina leşkerên dagirker, tevi Generalê Teneke ku ji aliye gerila ve bi besdariya gelê gund ve tê kirin, hem balkêş e û hem ji zêde cih dane kenê.

Bi kurtasî lîstik bi awayekî trajî-komîk rastiya gelê Kurd a berbiçav dixwaze nîşanî gelê Kurd bike. Kesê ku jiyana gund zanibe, tehde û pêkutiyên leşkerê Romê dîtibe, lê bi xwe bûbe, di vê lîstikê de dê xwe bibîne. Hem dê bikene û hem ji dê ji xwe re bigirî. Ango di lîstika Generalê Teneke de du heqîqet li cem hev in: Ken û girin.



Cemîl Bender

zopotamyayê ye. Cemîl Bender her wiha li hember teza ku gelê Kurd ji Ewrûpaya Bakur hatine, derdikeve û dibêje ku gelê Kurd ji gelê herêmê yên heri kevin e. Her wiha sarezatiyê Kasit, Gutî, Lori û hwd, wek pêsiyêne gelê Kurd da nisandan.

'Şarezatî ji Mezopotamyaya Jorîn derket'

Endamê Encûmena Zanistê ye Enstituya Kurdi Cemîl Bender, di 20'ê Heziranê de li bajarê Stenbolê saet di 13.00 de li Tarik Zafer Tunaya Kultur Merkezi (Navenda Candê ya Tarik Zafer Tunaya) li ser dîroka Kurdi konferansê da.

Di rîzekonferansa duymen de ya ku Enstituya Kurdi amadekekiribû. Cemîl Bender da xuyan ku, şarezatî (şaristani) ne li Mezopotamyaya Jérîn lê li ya Jorîn dest pê kiriye. Bender di konferansa xwe ya dirêj de, li ser arkeolojiyên ku li Kurdistanê hatine kirin rawestiya û iidea ya xwe bi berhemîn arkeolojik yên Tirk û Ewrûpayî girê da ku, bi destxistina bermayı û tistêne ji kolanen Qotê Bercem (Erxenê) û Newala Colê derketine re, nêrinâ der barê ku şarezatî bi Sumeran dest pê kiriye, sero-



Mîrê rewşenbîran Celadet Bedirxan wiha bangî gelê Kurd dikir (2)

'Herdu lingên xwe bînin aliyekî'

Kalê Ciwan

Di nava vê rewsa dijwar û xedar de Celadet Bedirxan fena bijiskeki jîr û zana, an wek mîmareki xweshosta û navdar li Kurd û Kurdistanê zivî, dest bi saxkirin û avakirinê kir. Ew, bijiskê jiyanâ neteweya Kurd û mîmarê avakirina ximê (hîmê) mîlî ye. Celadet di hejmara 20. a kovara Hawarê de wiha teshîs kiriye derdî me: "Mîleten bindest heyîna xwe ji serdesten xwe, bi du tîstan, bi du qewetan, bi du cekan di-parêzin. Ol yek, ziman dudo. Lî heke ola mîletê serdest û bindest yek bibe, hengê cek, yek bi tenê ye û bend tenê ziman e." Mîrê Botan armanc tespit kiriye û yek alternatif kîf kiriye ku, ew ji hengê cek yek bi tenê ye û bend tenê ziman e. Ji ber vê yekê giraniya xe-bata xwe daye ferheng, rîzman, alfabe, stran, cîrok, metelok, folklor û edebiyatê. Kadroyek xurt heye. Hevalen wî yêng ji dil û can gis welatparêz û hunermend in. Rewsen Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Osman Sebî, Cegerxwin, Qedrican, Ekrem û Qedîr Cemîl Pasa, Hesen Hisyar, Hemzayê Miksî, Nureddin û Dr. Naffîz Zaza, Goran, Sakir Fetah, Tewfîk Wehbî, Mistefa A. Botî û gelek welatparêz û xwendevan li dora Hewarê û xwediye wê kom bûne. Divê ku em xebata Sêx Eb-direhmanê Garisi ji, ji bir ne-kin.

ARMANC RIZGARI YE

Celadet Bedirxan di hejmara 17. a Hawarê de wiha dibêje me Kurdan: "Xorto... Armana te rizgari ye. Rizgariya welat û mîleteki ye. Navê armana te Kurd e. Kurdanî ye. Tu lê dinêri ecêbmâyî dimînî. Erê tu dibînî dest. ling. mil. pol. parsû. parxan. her-tîstêñ wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş. yê cepê berepas dicit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş. ne ji pas. Ji ber ku, ji aliye-kî ve bi pêş ve, ji aliye din ve bi paş ve tête kîşandin. Tu zanî cîra xorto...? Lewma ku her du ling ne yek in. Di navbera wan de yekîti nîn e."

ey Celadet/ Sahê min rîberê min pîr edalet/ Tu binvîse li Hawarê selâman/ ji ber min ve li Kurmancan temaman."

"- Ci Kurmancê Enadol û ci Sûri, ci Goran û ci Loran, ci Sorî, ci Gavan û ci Sapan û ci mir e. Gelek bêhtir li Kurmancê Cizîr e."

Ev silavêni Cegerxwin bi saya Hawar a Celadet li seranserê welat belav bûye û ketiye guhê hemû Kurdan. Celadet Beg ji bo Hawarê wiha dibêje: "Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwenasîn e. Xwenasîn ji me re riya felat û xwesiye vedike. Kesê ku xwe nas dike, dikarê xwe bide naskirin."

Ji bo ku Mîrê Zirav xwenas be û xwe û gelê xwe, bi hemû

Celadet, dîsa hawar dike û dibêjê: "Xorto... Bi ser kela me de girtine. Ji derve dijmin dirêjî me kiriye. Ji her mîlî ve êris. Di hundirê kelê de serekî din, bêeman û ji yê pêsin me-zintir û dijwartir. Serê me ye bi hevûdin re. Di mal de jî dij-min... Herê Xorto... Birîna me ya mezîn û xedar, dexes ye (hesûdî), berberî ye, jana dexesê ye." (Hawar hejimar 17 rp.6) Gelo ji azadiye xwestir di din-yayê de ci heye? Ev behsa ci ye? A kîjan meqam û nişanî ye? Wê hişê me kengê bê serê me?

CEGERXWÎN Û CELADET

Cegerxwinê nemir ji bo mîrê Botan di divana xwe ya Sewra Azadi (rûpel 141-143) de wiha dibêje:

"- Begê min, serwerê min

"Xorto... Armana te rizgari ye. Rizgariya welat û mîleteki ye.


Navê armana te Kurd e. Kurdanî ye. Tu lê dinêri ecêbmâyî dimînî. Erê tu dibînî dest. ling. mil. pol. parsû. parxan. her-tîstêñ wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş. yê cepê berepas dicit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş. ne ji pas. Ji ber ku, ji aliye-kî ve bi pêş ve, ji aliye din ve bi paş ve tête kîşandin. Tu zanî cîra xorto...? Lewma ku her du ling ne yek in. Di navbera wan de yekîti nîn e."

kesî bide naskirin Emîn Eli Bedirxan ji Cizira Botan dengbêj, çirokbêj û mitirban dibe li mala xwe bi cih dike. Ronakbîr û hemû welatparêz û xwendevanen Kurd bila ji vê, ders bigirin.


Celadet Bedirxan kurê Emîn Bedirxan é ku Serokê "Kürt Teali Cemiyeti" (Komeleya Pêşketina Kurd) yê duyemîn e. Bapîrê Celadet Mîr Bedirxan, di medrese û xwendegêhê Kurdan de li Cizira Botan, bi dengê Dîwana Sêx Ehmedê Xanî. Melayê Cizîr Feqiyê Teyran û gelek alimên xwenas û xwerû mezin bûbû. Bedirxan Pasa, ji ber vê yekê ye ku, xwa-nas kiriye. Ji ber vê ye ku, hê ji Bedirxan Beg, mîr, beg û pa-sayen seranserê Kurdistanê tê-n naskirin. 'Xwenasîn' bi serê xwe nayê cih. Sertê berê û herî girign ew e ku, neteweyek, gel û komeleyek, ji bo ku xwe nas bike, bi kîri xwe û mîletê xwe bê û dereca çand û zanîna wî (qewîl) bilind bibe: divê bi zimanê xwe, li gor çand û zanîna dor û berê xwe bixwîne û li ser vê xwendinê çarida xwe bi-xemilinê. Gelo ji bil feqiyen medreseyan, cend xwendevanen me bi dor û berê xwe ve girêdayî ne? Cend ji van rind zimanê xwe dizanin? Wexta ku me di salen 1960/65 an de pirs dikirin, hevalen me yêng di dilê me de qedirbilind û ji me zanatir digotin ku: "...Xem nîn e. Bomîdyen, Ferhat Ebbas û Ehmed Binbelâ ji bi Erebî nizanîn, lê mîletê xwe xilas kirin." Me ji, ji dilê xwe yî saf bawer dikir. Hêvidar im ku, kes li min negire. Belê cawa mirov zimanê mîletê xwe heya roja iro hîn nebe? Bi ci evcend fedekari û zehmet dixwînîn, ji bo gotarek bibêjin ji vê metropolê dicin ya din û ilm û irfan ji devê wan dirije, lê gava ku meseleya ziman tê holê "Kürtce bilmîrem, öğrenecegim." (Kurdî nizanîm, ezê hîn bibim) dibêjin (?). Gelo ez xelet im, an kevne-perest im, pasvemayî me, ci me?

XEBATÊN WÎ YÊN AKADEMİK

Ku ne dewleserê mîrek û malbatén mezin ên Kurdistanê bûya, iro belki yek weke Xani. Bati. Koyî û Cizîr tune bûn... Wexta ku ev kes û kesen ku da-ne ser cexera wan disa di medreseyan de û xwebatên xwemal nebûna, gelo wê halê me ca-wa bibûya? Helbestvan, nivîskar, Filozof û zaneyên Kurd hemû ji xwendegêhê bin ferman-dariya mîrekên Kurdistanê wek Bilis, Hekarî, Cizîr, Amed, Re-wandiz û Silêmaniye derketine.



Kamûran Bedirxan li Unîvîrsityea Sorbonê mamosneye Kurdi bû.



Sureyya Bedirxan û Mîr Celadet Bedirxan

Belê Mir Celadet, rûyê wan û yê me spî kiriye. Celadet bi kadroya xwe ya nemir ve, wek aqademîyeke mezin xebitiye rewsa ziman, alfabe, gramer û edebiyata Kurd xwes kiriye. Wek rewsenbîren Kurd dibêjin, "Hîmê alfabe û gramerê daniye." Ji bo ziman, wêje û hunerê, mala Bedirxaniyan û ne-maze Celadet, bi rojnameya Kurdistanê û Roja Nû, bi Kovara Ronayî û Hawarê gelek xebat kirine. Bi saya serê Celadet, iro ji gelek rewsenbir, huner-mend, zana û xwendevan digi-hijin.


Biranina 100 saliya Mir Celadet, biranina Kurdayetiye ye. Birhatina welatparêz û netewe-viniyê ye. Biranina cand, ziman, dîrok, edebiyat, folklor û

"xwenasiyê" ye. Biranina canfi-dayî, ezim û iradeyê ye. Biranina camêri û kamîraniyê ye. Biranina xeribî, belengazi, necari û hesretê ye. Bi gotina Cegerxwinê navdar: "Biranina Mirê zirav, giran serfiraz, huner-mend Mir Celadet Eli Bedir-Xan" Hêvidar im ku, hemû rojname, ko-var aqademî, enstitû, komele û ronakbîr vê biraninê neborîn û sala 1993 yan bikin sala Celadet Bedirxanê navdar û nemir.

Çavkani: 1- Hêvi, Kovara Canda Gisti, hej. 8 Havin 1992 Enstituya Kurdi. Parêş/Fransa 2. Hawar Cild 1, hej 19 Wergêr Mehmed Bekir, Wesanxaneya Hawar 1987 Sweden.. 3. Destpêka Edebîyata Kurdi - Mehmed Uzun wesanen Beybûnê, Enqere 1992.

Yezdanê ‘Yezdanê Mêşan’: William Golding

William Golding, dîtinên xwe her cîqas bi awa û hevokên cihêreg û balkêş diyar kiriye jî, di bingeha dîtinên wî de, mirov tişteki nû nabîne. Ew îdealizmeke paşverû diparêze û mejiyê mirovan tevlîhev dike. Golding li dijî ramana marksist e û dîtinên ku kemasî û xerabiyen di civakê bi hebûna çinên civakî şirove dîkin çewt dibine.



Mazhar Günbat

Xwediyê xelata Nobela 1983'yan nivîskarê Ingiliz

William Golding roja 19'ê Hezîranê cû ser dilovaniya xwe.

Nivîskarê navdar Golding ku imzeya xwa avetiye ser gelek berhemên wêjeyî û bi piirranî li Universiteya Oksfordê bi wêjeya Anglo-Sakson ve eleqedar bûbû, di nava xwendevanên xwe de bi xwe êdî zehf bi romana xwe ya "Lord of the Flies" (Yezdanê Mêşan) dihate naskirin. Golding nêrînên xwe yên balkêş yên li ser xwezaya mirovan ku di romana Yezdanê Mêşan de anibûn zimên, hem bala rewsenbir û ramangîren dinyayê kisandibû ser xwe, hem jî reaksiyonên tûj stendibûn û rexneyen giran lê hatibûn gitin.

Golding ku di heştê û yek saliya xwe de ji ber krîza dilê xwe, weke ku rojnamevanekî Fransiz dibêje "Mêşen xwe sêwî histin", ji deh salan û vir ve li gundekî

bajarê Tulîmarê bi tena serê xwe dijiya.

Golding ku piştî zewaca xwe ya di sala 1940'an de, di artêşê de wezîfe stand û pêvajoya pênc salan li ser deryayê di keştiyeke leşkerî de kar kir, di vê demê de ramanên cihêreg û balkêş di mejiyê wî de cih girtin. Golding bal dikisîne ser xerabiyâ hundirê mirovan. Li gor Golding dijmin di hundirê mirov de ye, yanî tişteku xerabiyê an jî başiyê bi mirovan dide kirin ne egerên derve û mercen civakî ne. Ji ber vê yekê, xwediyê "Yezdanê Mêşan" idia dike ku, rizgariya mirovahiyê di hundirê her yek ji me de ye; ev rizgarî ne girêdayî sistemekê, baweriyeke an jî pêkereke derveyî me ye.

William Golding, dîtinên xwe her cîqas bi awa û hevokên cihêreg û balkêş diyar kiriye jî, di bingeha dîtinên wî de, mirov tişteki nû nabîne. Ew îdealizmeke paşverû diparêze û mejiyê mirovan tevlîhev dike.

Golding li dijî ramana

marksist e û dîtinên ku kemasî û xerabiyen di civakê bi hebûna çinên civakî şirove dîkin çewt dibine.

Nivîskarê Ingiliz William Golding, dibêje ku berpirsiyariya tevlîhevî û genteşiyen ku mirovan diêsinin ne ji ber hebûna çinêkê, neteweyekê an jî sistemekê ne. Bi giranî ev tevlîhevî ji ber xwenûkirina reaksiyonen zarokî yên hundirê mirovane û di mercen azad de derdi Kevin meydanê û xwe nîsan didin.

William Golding roja 19'ê Ilona 1912'an li basûre Ingilîstanê, gundê St Columb Minor hatibû dinê. Li Universiteya Oksfordê li ser wêjaya Anglo-Sakson xebitibû û tesîra vê wêjeyî di berhemên wî de xwe es-kere dane xuyakirin.

Demekê di keştiyeke leşkerî de jî kar kir û di vê demê de bû xwedî dîtinên balkêş û dijber.

Romana Golding a navdar "Yezdanê Mêşan" ku li hemû dinyayê li dora 15 milyon heb hatibû firotin, di sala 1963'yan de bû film.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Destê hesin

D i 29'ê meha Gulana borî de li Enquerê 23 rayedar û fermandarê TC'ê li hev dicivin û biryar û raporekê amade dîkin. Li gor vê raporê, li hember PKK'ê politikayê nerm û 'Bi destê qedîfe' yên ku heta niha hatine meşandin bûne sebep ku PKK roj bi roj bi hêzir û xurttir bûye. Lewre divê ji niha pê ve, politikaya 'Desthesin' bê meşandin. PKK û şoreşa gelê Kurd bê imhakirin û qirkirin.

Rayedar û fermandarê TC'ê, politikaya Turgut Ö-zal a li hember PKK'ê nerm dibinin. Lewre jî dibêjin, divê politikaya nû li gor paşnavê Demirel sert û dijwar (weke hesin) be. Bi vî awayî jî dikaribin PKK'ê biperçiqin, şoreşa gelê Kurd rawestînin û dawî lê bînîn.

Li ser vê biryar û rapora faşist û hov, TC bi hemû hêzên xwe yên çekdar êrîş dibe Kurdistanê û agir bi ser ve dîbarîne. Diyar bûye ku, dê ev êrîş heta demeke dirêj jî bidomin. Divê em jî rind fêm bikin ku, karê guran gurîye, yê zorbe û fasistan jî barbarî û hovîtiye. Ferq di navbera wan de tune.

Penc û desten hemûyan jî wekî hev in, hişk û dijwar in. Tu car destê faşist û zaliman nerm nabe, pencen gur û hovan nabin qedîfe. Hemû jî wek hev in, hemû jî dijwar in, hemû jî xwînxwar in. Karê wan tim cerd û talan bûye, dê iro jî wilo be, lewre hov tu caran nabin mirov. Ew bî xwe jî dibêjin: "Em çejikên guran e, me şîrê dîleguran vexwariye". Di dîroka cihanê de jî bi van taybetiyen xwe cih girtine. Ji ber vê jî desten wan tu car qedîfe û nerm nebûne û nabin jî.

Heta ku qîlên (diran) guran neyên hilkirin û pencen wan neyê qutkirin, ji kuştin û qirkirinê venagerin. Dema ku gur dikevin nava col û kerîyan dixwazin ku hemûyan bikujin û qir bikin. Bi taybetî jî dema kerî bê şivan dimînin, hemûyan qir dîkin. Lê ger ku şivanen jîhatî û zîrek hebin, wê fersendê nadine wan. Col û kerîyan xwe jî êrişa wan diparêzin.

Nêçîrvan û nijdevanen jîhatî, zivistanan didin pey şopa guran, di berfê de diwestînin û di pozên wan de lê didin, gêj dîkin, bi guhêwan digirin qîlên wan hildîkin û wan ji cenewariya wan dixîn, bêzerar dîkin. Şivan û nijdevanen gelê Kurd jî iro şopêvan guran rind dîtine û nas kirine. Rewşa cihanê jî, weke berfa zivistanê rê û dirb li wan girtine, li pêşîya gur û hovan basûyen berfê çêkirine. Ger ku keys û fersendê lê anîn, wan bixin kemîn û dafikê, qîlên wan ên bi xwîn bişkînen û hilkin, pencen wan ên gemar û dijwar qut bikin, wan bêpenc û bêqil bîhêlin, dê jî xwînxwarî û cenewariya wan pêşîra xwe xelas bikin û wan ji çewkînê bixinin.

Ji vê pê ve tu çare û tedbîr tune. Ne xêr ji pencen wan ê qedîfe tê, ne jî ji yê hesin. Herdu jî qîl in, herdu jî penc in, herdu jî nebaş in. "Ne xêr li wî, ne bereket li yê din".

Jiyana mirov welatê mirov e!

Salar Amedî

Ji demeke kin ve ye ez li welatên Ewrûpa digerim. Her cıqas demeke kin be ji, di warê sénayî û xwesahî ya Ewrûpa de hesüdiyeke mezin ketiye dilê min. Ez dema çav bi dar û berê van deran. sekle plankirina bajarêwan dikewim, gelekî dihesidim. Wê demê Kurditiya min û bindestiya min edî zêdetir dikeve bira min. Ewliya Celebi di pirtûka xwe ya bi navê "Sevehetname" de dibêje ku. "Ez ji Ciayê Kurmenc heyanî Kerkükê cûm, min rûyê tavê nedî" ew cend ku Kurdistan bi dar û ber bû. Dema qala Kurdistanê dibû, bihusta misilmanan jê dihesidi. Ci mixabiniyek mezin e ku iro em ji sénahiyâ welatên Ewrûpayê dihesidin.

Dema welateki me yi serbixe û azad hebûna, xwediyê welatê xwe em bûna, me ji dê li welatê xwe binihertana, medê biañîna rewseke wisa ku, dema yekî biyanî bihatana welatê me, dê ew hesûdi bikira. Ger bav û kalen me bi xurti xwedî li welat derketibûna, dê em ji iro li welatê xwe, li ser axa xwe bûna. Ji welatê xwe zêdetir hezkirina weleteki din nediket dilê me.

Li ser xwesahiya Ewrûpayê ya bercav, min jiyana mirovên Ewrûpayê ji dit û wê demê ji dilê min li hev ket, sistemê mirov kîrine sekleki wisa ku, mirov ji jiyana civaki û ji mirovahîya xwe dûrbîne.

Di bin navê azadiya kesan de-ku azadi bi kesekî tenê nabe-tu pisîtiyên ku dûrî mirovahîye ne nemaye ku neketinê. Rewsek wi-sa ava bûye ku, di bin navê mirovahîye de jiyaneke heywani, jiyaneke tenê li xwe tê jiyandin. Sis-



Parastina xwezaya welatê mirov, bi serbixwebûna wê mimkun e. Iro weke mirovên Kurd dar, ber û hêsinahiyê Kurdistanê ji, ji dijminê hov re hedef in.

temê rewseke wisa cêkiriye ku her tist li ser bingehê berjewendiyê sexsi hatine avakirin. Sistemê bi xwe re, mirovan ji rizandîye, genî kirîye. Ji bêhna genî hestiyê pozê mirov disikê, dilê mirov li hev dikeve. Mirovahî, ber bi tékcûyînê ve dice. Mixabin-hin mirovên Kurd ji hatine di nav vê gemarê de winda bûne.

Berê du Kurd nikaribûn bêne kîleka hev, dema dihatin ji di nav wan de ser derdiket. Iro em

dibînin ku PKK'ê, li cihêk mîna Ewrûpayê, di nav çavê împeryalizmê de 130 hezar Kurd li hev dicivîne. Ev dibe tirs û xofa dilê dijmin û hemû dagirkeran û ev ji dide xuyakirin ku, ne PKK û tékoşîna PKK'ê bûna, pirrami Kurdistan Ewrûpayê niha di wê gemara Ewrûpayê de winda bûbûn. Ën mayî ji di demeke kin de wê winda bûbûna. Ji ber ku tu bawerî û yekîti wê tunebûna ku, wan li ser lingan bîhêle.

Rastiyeke din ji heye ku, dewletên Ewrûpayê her cıqas ji aliye sénahiyê ve dewlemend bin ji, ew sénayî pere nake. Jiyana wan i gemari sénahiyêwan ji gemirandiye û tu bêhna xwes té de nehistiye. Her weki jiyana wan, sénahiyêwan ji ne xwezayî ne. Dema ez kûr fikirîm û min ev rastî dîtin, wê demê min edî fêm kir ku, dibe iro ji, dinya ji me hesûdiya bike. Ji ber ku yê welateki dike buhist, bi taybeti mirovên wi

ne. Iro mirovahî li Kurdistanê sîn bûye. Qirêj û gemara dijmin a hezar salan, bi xwîna sehidan tê paqîjkirin. Ev dibe mînak ji hemû mirovahîye re ji. Dijmin ji sed salan û heya iro, tu dar û ber di Kurdistanê de nehist. Bi pirrani daristan û sénahiyê Kurdistanê şewitand, jê kir. Bi her awayî xwest ku jiyane li me bike dojeh.

Heya iro ji bêxwedîti her tiş dihate serê welat. Ji dewlemendi û rewşa wê ya stratejik, ki ji ku ve hat ji aliyeke ve talan û wêran kir. Daweta her civikî, li ser garisê me bû. Gepa şîrin, ji bo berazan gelek mezin bû, nikaribûn daqurtin. Berazén gerdûnê (dinê) Kurdistanâ şîrin, kirin car parce.

Dijmin iro ji her axa Kurdistanê bombe dike. Kurdistan di nava agir de hejtiye. Lî dijmin bi vî rengî gora xwe dikole. Nizane ku em zarokên agir in. Agir hêza me ye. Zanebûna mejiyê me, hêrs û kîna dilê me ye. Dijmin nizane ku dema arê Zerdeşî pêket edî venamire. Nizane ku ev agir bi xwina hêvî û ronahiyê me, gerilayen me, ges dibe. Nizane ku agir ji bo me jiyane. Em wan di vî agirî de disewitin. Ü nizane ku iro welat edî ne bêxwedi ye. Bi milyona zarokên welat li dû ronahîya partiyê, ber pê ve dicin û dibêjin. "An serkeftin, an neman".


Herci kesen ku ji welat dûr ketine: talûkeya heri mezin valabûna Kurdistanê ye. Werin rojekê zütir em ji desten xwe bidine hev, berê xwe bidine welat, dengê xwe di nav dengê gelê xwe kin û bi hev re bibêjin 'Biji Kurdistan'. Jiyana bêrûmet ne tu jiyane e, jiyane û mirovahî li welat e, jiyana mirov welatê mirov e.

XÂÇEPIRS

Ceperast: 1-Niviskar û rojnamevanê Kurd. Di Özgür Gündemê de dixebe. Li ser nezediroka Kurdan û rewşa politik a Rojhilata Navin gelek pirtûk nivisiye. Çend ji Pirtükêni wî ev in: "Li Rojhilata Navin Rêxistinê İslâmî", Di Çapemeniya Tirkan de Kurd", "Întifadaya Filistinîyan", Di Ségoeya Teng de Sê Serhildan" û hwd. Di wêne de tê ditin/ Èma sewalan 2-Serbaz/ Nexweşinek 3-Hîm/ Kinnivîna Lîtreyê/ Nekedikirî 4-Bî İngilîzi kinnivîsına 'Birêz'/ Pêxemberê filehan/ Baneşaneke bankirinê/ Rojek 5-Ashtiparêz 6-Binaxkirin 7-Veger/ Pê por tê rastkirin 8-Int 9-Li deryayê keştiyên barkêşîye/ Serokê eşirê 10-Ziman

Serejêr: 1-Hikumdar 2-Cihê ku alîf se-walan dixinê/ Li Tirkiyê ajanseke nûçeyan/ Din 3-Herzing/ Aşvanî 4-Mabeda Yahûdiyan/ Sembola Osmiyûmê 5-Sembola Bromê/ Sinc 6-Kesê naletkirî/ Ji arê genim tê çekirin 7-Beriya İslâmî navê pûtek/ Liq 8-Amûreke müzikê/ Bi emniyet 9-Dergeh, derwêşxane 10-Teze, ne kevn 11-Fêkiyeke tropikal 12-Paytexta Yewnanîstanê

Amadekar: Rasto Zilanî



BERSIVA XÂÇEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ

Ceperast: 1-Yaşar Kaya/ Si 2-Êlih/ İranî 3-Ramûsan/ Ra 4-Îdare/ Ateşe 5-Va/ Alewî 6-Aram/ Dûr 7-Mamedî 8-Erzan 9-Azad/ Ena 10-Bazar/ Ar
Serejêr: 1-Yêrivan/ Ab 2-Aladar/ Eza 3-Şima/ Amraz 4-Ahûramazda 5-Sel/ Ma 6-Kîa/ Edene 7-Arnawûd/ Na 8-Ya/ Tîribar 9-Antet 10-Şî 11-Re 12-ÎRA/ Û

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li derive: Y. Serhat Bucak İş Bankası Çağaloğlu Sub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkiyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevi kopîyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bisînîn.

Navnîşana Welat: Kadırga Liman cad. No.92 Eminönü 34490 İstanbul Tel: 518 25 28

Fax: 518 85 54

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
6 meh 120.000	60 DM
12 meh 240.000	120 DM

Mizgîn û têkoşîna zarokên Kurdan



Heta ku têkoşîna çekdarî li Kurdistanê bi hêz nebûbû, dê û bavê zarokên Kurd nikaribûn navê Kurdi li zarokên xwe bikin. Vêga êdî daireyên nifusê nenivsîn jî Kurd navê Kurdi bi koteke be jî li zarokên xwe dikin.

Dema fermana Kurdan radibû navê zarokên me Ferman bûn...

Nîşaneke biçük kêfxwesişî xuya dike, navê zarokên me Mizgîn in...

Ferman!...

Egit!..

Mazlûm!..

Kurd û Kurdistan seran ser gûlên têkoşînê ne.

Heta azadî û serxwebûnê gere navê zarokên me

Têkoşîn!..

Serhildan!..

Raperîn bin!..

Edî, dîsa soz û peymana mezin bûye

Zer zanit

Zor zanit

Devê tifinga mor zanit!..

Di şertîn aştîyê de mafêne Kurdan qet tune ye. Dewleta Romê, li ser Înkar-kirina gelê Kurd hatiye avakirin. Mafêne gelêri dixwe û zikê xwe mezin dike. Gerden li ser gerdenê ba dide.

Dîrok xweş dizane ku, ev sazûmana mijokdar û faşist ji dema Osmanî jî paşverûtir e. Lewre navê Kurdan serbest bû. Rojname bi navê Kurdistan derdiket. Di avakirina Cumhuriyeta Tirkan de peyvîn "Kurd û Kurdistanê" hatine qedexekirin.

Dê û bavê Kurdan, navê Kurdan nikarin li zarokên xwe bikin. Kin û kurt misalekê emê bînin ziman. Sal 1980. Bajar Mêrdîn. Qeza Mahserî - (Ömerli). An jî cih û wareki Kurdistanê. Bila zarokek were dinê... Bila jî dinê re bibêje: "Merheba!.. Bi devkenî, rû-

gesî, kêfxwesişî.. Şîn, şadî demeke kin bi hev re bimesin!..

Çiroka navê Têkoşîn

Sala 1977'an keçik hate dinê. Bavê wê pêşî navê wê danibû Mizgîn!.. Saet, roj û meh û sal, di-nifusa wê de nifusand. Nifusa qîza xwe stand. Anî li ber serê wî dani. Bermaliya wî got:

– Te çawa çêkir? Navê Kurdan nanivisîn?

– Kî dibêje? Tiştekî wiha tune? Ji mirovîn nezan re dibêjin qedexe, ew jî wer dîkin. Min navê qîza xwe nifusand. Ezê bi wê nifusê, wê bişînim dibistana Tirkan jî.

Pîrek û dayikên Kurdan mîna kaniyê ne. Ji zîlm û zorê re kele ne. Ji zêde-bûnê re behra bêbinî ne. Sal vegeî lawikek jî hat dinê. Bi girî ji hemû mirovan re got: "Merheba!.."

Bavê wî biryar da: "Ezê navê kurê xwe deynim Têkoşîn." Bermaliya wî got: "Tu zanî. Çawa kêfa te tê wisa bike."

Bavê Têkoşîn berê xwe da bajêr. Şadî, mamosteyê zarokan bû. Di dibistanê Tirkan de zarok didane xwendin. Ew ji zarokan, zarokan jê pirr hêz dikir. Mirovîkî serbestîxwaz bû. Mamostaniya Tirkan jê re ze-waca bêdil bû. Lewre heta mihletekê girîng bû ku, mamostaniyê bike. Bi mafê mamostaniyê leşkeriya Tirkan jî biboranda.

Daxwaznameyek nifusand. Kaxezê navan dagirt. Navê lawê xwe delal nifusand.

sand. Bi tîpêne mezin: Têkoşîn nifusand. Berê xwe da nifusê. Dora wî hat. Mamûr lê nêrî. Li bajêr, ji sedî not ew nas dikirin. Mamûr pêşîn ew pîroz kir. Lé belê gava navê wî dît hêrs bû. Mamûrê nifusê Ereb bû.

– Ev ci ye Xoce?
– Nav e
– Ev ci nav e? Min di he-yata xwe de navê wisa nedîtiye!

– Va ye te dît. Hê jî tu dê bibînî.

– Li qisûra min nenêre. Ez vî navî nikarim qebûl bî-kim.

– Çima?
– Qedexe ye!
Di kîjan qanûnî de dinivîsîne?

– Ez nizanim. Here ba midûre me?

Ewraqê xwe girtin û çû ba midûr. Li derî xist. Kete hundir. Midûr jî ew nas dikir. Gava Şadî dît, keniya.

– Kerem bike Xoce. Tu û vê derê.

– Kurekî min hat dinê. E-zê wî qeyd bikim.

Ser seran, Xwedê emrê wî direj bike. Şadî dengê xwe nekir. Ewraq dirêj kîrin. Midûr, berçavika xwe rast kir. Pênuşa xwe xist destê xwe. Gava nav dît, mîna ku marek di paşila xwe de bîbîne:

– Eywax li min... Ev ci nav e?
– Navekî Kurdi ye.
– Xoce qey em li (Japon-ya) Yaban in? Têkoşîto. Ev ci nav e?

– Ev navê kurê min e.

Rast bi xwîne. Têkoşîn!... Ewraq avêtin ser masa xwe.

– Ev nav nabe! Tu jî wekî herkesi navekî bi usûl deyne.

– Navê kurê min ev e! Li gorî kêfa te nikarim navê lawê xwe lê deynim. Ez ne insa-nekî gundî û nezan im. Ez bi qanûnê te, bi ya Tirkan jî zanim. Tu jî Kurd i. Lê Kurdekkî bêesil i. Xwe înkâr dikî.

– Here ba qeymakam.

– Ez naçim ba qeymekam. Lazîm be tu here. Ezê vî navî binivisînim. Heta si-behê gere ev nav bê nivîsandin. Derî girt û derket derive..

Der heqê navê Têkoşîn de, dadgeh danîn. Navnas yekî Ereb bû. Bavê Têkoşîn hazir bû. Qanûnê li ser na-van xwendibû. Tu qedexe-kîrin nedîtibû. Dadger cihê xwe girtin. Hakim pîrsî ji Şadî

– Oğlunun isminî böyle koymaya israrlı misin? (Tu îsrarkarî ku vî navî li lawê xwe deynî.)

– Evet (Belê)
Hakim li navnas nêrî:
Nedir bu ismin anlamı? (Ci ye mana vî navî?)

– Wellah Hakim Begim ben böyle bir isim gorme-mışım, duymamışım. Zatenî bu Şadî Kürtçînin tekîdir. Bizim bu gozel kezayî bu ve bonun gibiler bozdî. (Weleh hakim beg, ji xwe, ev Şadî ji berê ve Kurdekkî e? Nav-çeya me ya delal wî û yên wekî wî xera kîrin.)

Hakim hêrs bû,

Tamam be adam... Bîz senden ne sorduk sen ne söylüyorsun

(Em ji te ci di pîrsin, tu ci dibêjî...) Li Şadî vegeeria:

– Nedîr bunun gerçek anلامî? (Ci ye mana vî navî bi esasî?)

– Hakim Bey, bu ismin gerçek ve mecazi anlamî şudur: Mücadele! ... Bunun da Türk halkın gelenek, görenek ve örf ve adetîne aykırılık durumu yok. (Hakim Beg, bi rastî û misalî, mana wî navî Têkoşîn'ê. Ew jî ne li dijî gelê Tirk û ditîn û adetê wan e.)

Hakim fikri: Şaş ma ci bibêje. Gere biryarekê bida-na.

– Yaz kizim! Adı geçen i-simle ilgili olarak davanın devam ettirilmesinde hiç bi verî elde edilmemiştir. (Binivisîne qîza min! .. Ji bo darizîna (mehkemekirina) vî navî tu sebep tune ye...)

– Yanî davanın feshîne karar verildî. (Ango, biryara me, fesihkirina vê dozê ye...)

– E Ereb paştûyê xwe xwurand. Şadî, kêfxeş û serfiraz bû. Nifusa qîza xwe Mizgîn, deranî. Ya Têkoşîn jî danî balê... Mizgîn... Têkoşîn Têkoşîna Mizgîn... Navekî din jî kete bîra wî dilê wî firiya, hat ber zimanê wî da der:

Mizgîn Tekoşîn kengî... Kengî kengî
Edî rabe Kurdo
Dem bû derengî
Şükrû Gülmüs

Li paytexta Osmani, bajaré Stenbolé bi navê Navenda Canda Mezopotamyayê dezgeheke çandî ya Kurdi heye. Ev dezgeha çandî bi awayê fermî di 29'ê meha ïlona 91'an de vebû. Dema mirov ji aliye Unkapani ve here Taksimê. li aliye milê rastê lewheyek rengin di nava hemû lewheyen de balê dikisine. Lewre rengîn lewheyê ji mirovê Kurd re qet ne biyan e. Li sér lewheyê bi Tirkî hatiye nivisandin ku ew der Navenda Canda Mezopotamyaya Jorîn e.

Belê di vê avahiyê de calakiyên çandî têne pêskeskirin. têne amadekirin. Di nav van calakiyan de ci tune. Hema hema her tistê di sinorê derfetê de li wir têne kirin. Muzik, sano, sinema, govend, wêne, koroya muzikê ya zarokan û hwd.

Bi germbûna Kurdistanê re, jiyanâ candi li Navendê ji girm bû. Lewre di 19'ê meha Heziranê de hem **Pêşangeha Pîseyên Desti ya Kurdi** ku Besa Folklorê amade kiriye, pêşangeha Feyzi Bilge ya wêne û peykeran û hem ji sanoya **Jiyana Nû** ya bi navê **Generalê Teneke** dest pê kirin. Herdu pêşangeh heta 4'ê Tirmehê dê bidomin.


Di vir de calakiya ku em dê li serê rawestin pêşangeha Besa Folklorê ya Pêşangeha Pîseyên Desti ya Kurdi ye. Cih li qata jorîn di menzelekê de ye. Dema mirov dertê jorê kec û zilamén bi timtêlén neteweyî xemili bi leqayî mirov têne û xérhatini û këfxwesi di mirov didin. Bi vê yekê re jix-we lerzinek mirov hiltine. Di pêşangehê de ci nîn in. Di maleke Kurdistanê ya dewlemend de divê ci hebe li vê pêşangehê he-ne. Na, na! Wele ev der tam mina muzyeyeke bicûk i dewlemend a antropolojiye ye.

Ji firaq û amanan mina misin. beros, sihan, meqilk, kevgir, hesk, lengeri, kevcîyen darin, sêl û hwd. cêr, dene, serbik, xeml û xêzen bûkan, neqsên dest, kil-dang, kemberen ziv, morik, kofî, xeftan, sebe, ji xali, xalice, car-cim, secade, ber, têr, emeni, rûyên balîfan, celtik, têrren cihêzan, parzon ên ku jîmîn kocer pitikên xwe dixin navê, li pistâ xwe girê didin û pê re kar û barênen xwe dikan.

Ev tistênu ku me li jor navê wan bi lev kir nizanim ji sedi cend bû. Ev destkirê Kurd ji gelek hêlén Kurdistanê bê bi ci kul û derdan Besa Folklorê anibû cem hev, yênu ku dizanîn, dizanîn.

Ji Sêwaz, Dêrsim, Wan, Qers, Agiri, Amed, Pirin (Semsûr), **Şirnex, Cûlemêrg** (Hekari), **Mûş, Sêrt, Ruha, Mêrdin, Çepekkür** (Bingol). Ev esyayê ji van herêmîn Kurdistanê bi alîkarîva rîveberiya Navenda Canda Mezopotamyayê û bi hewl û kîferata Besa Folklorê hatin cem hev. Koma Go-vendê **Serhildan**, bi hemû endamên xwe ve besdari amadekirin

Li NÇM'ê rojê çandî




Di vê muzyea bicûk a dewlemend de, kîferata endamên Beşa Folklorê bedewiya destkirê gelê Kurd bi me dan çêstin (tamkirin). Di herdu wêneyên jorê de zengîniyeke celeb bi celeb ên pîseyên desti nîsan didin. Wêneyê jêrê ji li gorî daxuyaniyê rayedarê pêşangehê goreya pakrewanê me yî hêja Egît e.

na vê muzyea bicûk, lê dewlemend bûye. Kom, govendê do-ra **Amed, Pirin, Mûş** navce-ya Gungumê (Warto) dilizin û ji bo hinbûna govendê dora Bîlis û Navceya **Wanê Saxê** xebatê xwe didomînin.

Gava mirov li tê pêşangehê digere his û meji xwe beri kûrahi-ya dirokê didin. Biranîn li mirov radibin pêdarê, pêjn xwe di dilan de dipêlpelînin. Jiyana kevin tê bîra mirov. Bi rasti ki dibe bila bi-be, dema cav bi van nirxên kevin dike cinginji seri wi dice, qurpin dikeve nav dilê wi, hisê wi tê serê wi, li xwe werdiqile, li paseroja xwe werdiqele.

Di nav vê dewlemendiya ren-gin de, di nav van nirxên dirokî, yêne rehêne (damarê) gel de mi-rov hê ji rexneyê ku ronakbirêne me li hêzen dagirker, mêtîngeh-



kar dikirin, bi taybeti ji yêne der barê talankirina nirx û hêjahiye-ni candi de têdigîhîje. Lewre talankirina candê, bisivîna heri dijwar e, heta jê re te gotin, qelinoka spi. Hemû hêzen impêryal, dagirker, mêtîngehkar talankirina candê, tunekirina wê ji bo bisivîna (asimileyâ) gelekî, ji xwe re wek azineyekê (metodekê) bi kar anîne. Cawa dareke jîndar, terr ji koka xwe ku were birin hisk dibe, her wisa ji bo ji navêhîlinâ gelekî ji talankirin, wêrankirin û tunekirina candekî wisa ye, bêresenkirin, bêseskirina gelekî, qelandina gelekî ji bi candê ve girêdahî ye.

Herci ku em li wir bûn em ji cûne hatina mirovan re bûn didevan. Gel qefle bi qefle dihatin ditina pêşangehê. Min bi xwe du roj li ser hev cûnûhatina kesan sopand. Tev bi dileki sad, bi mu-

rûzekî xwes, bi bisirîneke këfxwes cihê dibûn ji cihê pêşangehê.

Ji serdanan yek wiha digot: "Ez vanan tev dizanîm. Min ev esya ditine. Lê bi hev re ditina wan manyeke din, girîngiyeke din, zengîniyeke din di meji û serê min de afstrand. Em xwe tê de dibînin."

Di roja duduyan de pirekek bi hin esyayê hêja re hate pêşangehê. Esyayen li nav menzelê ro-kire erde, bermalê. Bi emaneti dida peywirdarê (wezifedarê) pêşangehê da ku bêne raxistin. Pireka cavşin, kejikî, devlikîn û zarsérin pêjnên xwe ji me re di-got: "Ez roja pêsin hatim dîtinê. Iro ji ez hatim temaseya listika sanoyê. Min ev esyayê hêja ji, ji raxistinê anî. Bila di vê xebatê de alîkariyeke me ji hebe."

Di nav tistênu ku anibû de kem-

bereke zîvin hebû. Li gorî wê kember hindiktirin sed û pênci sal emrê wê heye.

Li gorî daxuyaniyê berpirsi-yaren pêşangehê ev esyayen ku di vê de hatine raxistin. hin jê hatine bexsandin, hin hatine kirin û hin ji bi emaneti ji bo raxistinê ji kesen xêrxwaz hatine standin.

Ji her cureyi, ji her statuyê, cîn û tebeqeysi mirov dihatin û dicûn. Hinke, bi taybeti ji kesen ku ji wan nirxan dûr neketibûn xwe ranedigirtin, ecêbmâyîna xwe, heyiîna xwe bi peyvîn kin mina "Wey", "Ca tu le biner" dihanin ziman.

Lê ew xali, emeni, carcin, ber, têr, celtik, goreyên ku ji rîs û hiriyê hatibûn racandin, yekbûna canda gelekî bi awayekî berbicav û zelal bi mirov didan nîsan. Ew motif, neqs, nîgar û teseyen geometrik ên, ku di emeni, xali, ber, carcin û hwd, de hatine bikaranin, di gel hemû cihêren-giyen civakî wek, ol (din) meh-heb, mercen erdnîgarî û hwd, yekitiya canda gelekî derdixist berçavan.

Nigar û neqsên ku li sér cifte-xas û etamin hatibûn cêkirin ji gelek balkes bûn. Minak di yekê de wêneyen du pirekan li ser hespê tevî kûcik hatibû neqisan-din. Dema cûyîna nécirê teswîr dikir. Ev rews ji bo civakên islamî gelek girîng e. Lewre ola islamî neqsandin û xêzkirina mirovan qedexe dike. Ev kirin, her weki ku li hember vi qaydeyi (qanûnî) serî hildan be.

Lê di pêşangehê de goreyeke ku di carcoveyeke rengin de hatibû raxistin ciheti, rûmetiya xwe, giranbuhabûna xwe dida der. Gorê hinek peritibû. Quî û kun tê de cêtbûn. Gorê ji aliye mirove-ki gelek hêja ve hatibû bikaranin. Li gorî nivisa serê û peyvinen berpirsiyaren pêşangehê ev gore goreya Egîde Kurdan bûye. Belê we sewt nebihist ya serleskeren Kurdan sehîden sehidan bazê artesa gelê Kurd, serokê manewî yê ARGK'ê **Mahsum Korkmaz** bû.

Ev pêşangeh dê 15 roj li ser hev vekir bimîne. Di vê muzyea ku temenê wê dê 15 roj be, ger ku hûn bixwazin xwe bas nas bîkin, biranîn xwe vejinin hest û hisê xwe yê neteweyî siyar bîkin, li benda we ye. Riya we dipê. Bi dileki ges, bi rûyekî bisrandiyê xwes, tevî amadekarên xwe ve li hêviya we ne.

Ger ku dawîya hefteyê rojê semi û yeksemê -ku hûn xebatkar bin, nikarîbin rojê din seri li wê bidin- riya we bi tanga Tarlabasiya Taksimê ket teke peke mekin, seriyek li Navenda Canda Mezopotamyayê bidin. Ese hûn leqayî calakiyekî candeyî bén. Di dema xwe ya vala de herine wê hafé. Li benda we, li hêviya we û riya we ji dil û can dipê. Ne bi lêveke kirî, bi murûziki tirs û bi awirekî tûj.

Zana Farqînî